
# PKK bingeha civaka azad e

Ji damezrînerên PKK'ê Ali Haydar Kaytan anî ziman ku PKK bi armanca afirandina jiyaneke alternatîf ava bûye û wiha got: "Cewherê felsefeya Apocî,



'divê jiyan di ser her tiştî re bê girtin, heke dê jiyan hebe divê azad be yan jî dê qed nebe'... RÛPEL - 5

# BELGEYA ZINDÎ YA QETLÎAMA DÊRSIMÊ



**Kalê 82 salî Huseyîn Gul, serpêhatiya komkujiya Dêrsimê ya sala 1938'an wiha vegot: 'Guleyek bi serê xwîşka min ket. Serê xwîşka min parçe bû. Heman guleyê du tiliyên destê min ê rastê jî jêkirin'**

Carna wêneyek gelek tiştên ku bi gotinê neyên ziman vedibêje. Di ser serhildana Dêrsimê re 72 sal derbas bûn. Her çiqas 72 sal di ser bûyerê re derbas bibin jî kesên bûne şahidên wahşeta wê demê gav bi gav vegotin û dîsa bûyer li ber çavan zindî kirin. Şahidan diyar kir ku wê demê mirov di odeyan de kom dikirin û didan ber keleş û çekên otomotîk û gulebaran dikirin, piştre davêtin çal û koncalan. Bago Polat got 'min destê xwe da ber serê xwîşka xwe. Em hatin gulebarankirin. Guleyek bi serê xwîşka min ket. Serê wê parçe parçe bû. Heman guleyê du tiliyên destê min ê rastê jî jêkirin'... RÛPEL - 4


# ROJEV

30 Mijdar - Duşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 18


## PKK LI VÊ MALÊ HATE AVAKIRIN

DTP'iyan gundê Fîsê yê bi ser navçeya Licê yê civîna damezirandina PKK'ê lê pêk hat ziyaret kirin û li derdora mala civîn lê pêk hatibû darên çamê çandin û peyama aştiyê û biratiyê dan. Çalakvan bi coş û heyecaneke mezin li odeya ku PKK lê hatiye avakirin, geriyan.





## Li hemberî şer şano

Ji Iraqê, Şanoya Ne Pêkan bi şanoya Behra Bêdengiyê beşdarî Mîhrîcana Şanoyê ya Enqereyê bû. Koma Şonoya Ne Pêkan niha li Bexdayê xebatên xwe didomîne. Koma şanoyê, li dijî şer ev 15 sal e xebatên xwe didomîne... RÛPEL - 9

## Ji Selamo 'Kenên Spî'



Li naçveya Nisêbînê ya Mêrdînê kişandina fîlmê kurdî yê bi navê "Kenê Spî" dest pê kir. Derhêneriya fîlmê Shîar Abdî yê li Ewropayê dijî dike û senaryo jî Selamo nivîsiye. Her wiha Selamo di fîlmî de jî dilîze... RÛPEL - 9

# Berpirsyarên pergala Îmraliyê hişyar kirin

Komîteya Tenduristiyê ya Koma Civakên Kurdistanê der barê rewşa tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de daxuyaniyeke nivîskî da û ji CPT û DMME'yê xwest ku ji bo sererastkirina şert û mercên Ocalan berpirsiyariya xwe bi cih bînin

### 'OCALAN BÊ NEFES HATIYE HIŞTIN'

Komîteya Tenduristiyê ya KCK'ê anî ziman ku nebaşbûna pirsgirêkên tenduristiyê yên Ocalan fikarên wan zêde kirine û wiha got: "Bi salan e dîlgirtina Rêbertiya me didome, her wekî giranbûna şert û mercên tecrîdê têr nedikirin, niha jî bê tevger û bê hewa hatiye hiştin."

### 'BÊWIJDANIYEKE MEZIN TÊ KIRIN'

Di daxuyaniya nivîskî ya Komîteya Tenduristiyê ya KCK'ê de hate diyarkirin ku berpirsyarî şert û mercên Îmraliyê pir giran e. Daxuyanî wiha domiya: "Ev bi tenê bêhiqûqiya saziyên têkildar nîşan nade, di heman demê de bêwijdaniya wan jî nîşan dide."

### 'DIVÊ ŞERT Û MERC BÊN RASTKIRIN'

Komîteya Tenduristiyê anî ziman ku Komîteya Pêşîlêgirtina li Îşkenceyê ya Konseya Ewropayê û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê rasterast ji vê rewşê berpirsiyar in û ev bangewazî kir: "Saziyên tekildar dixwazin şert û mercên Ocalan demildest bêne sererastkirin."... RÛPEL - 5




**Çalakiyên nerazîbûnê li her derê dewam dikin**

*Şerokê Rêxistina DTP'ê ya Mêrsînê Prz. Serhat Olmez, di vekirina avahiya Nûnertiya DTP'ê ya Taxa Çîlekê de axivî û diyar kir ku Ocalan xistiye gorê û wiha got: "Hikûmeta AKP'ê Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan neqlî girtîgeha wekî gorê kiriye."*

## Rewşenbîran jî xwest şert bên rastkirin

Piştî bihîstina têkildarî girankirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nerazîbûna gelê kurd zêde dibe. Rewşenbîr û siyasetmedaran bal kişand ser tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan te meşandin û xwestin ku heyetên serbixwe li Îmraliyê vekolînê bikin. Rewşenbîran xwest ku di zûtirîn demê de şert û mercên Îmraliyê bên sererastkirin. Rewşenbîr û siyasetmedaran bal kişand ser tecrîda giran a li ser Ocalan... RÛPEL - 4

Vegera ji Îmraliyê...
Adil Zozanî - R.5

## Li dijî êrîşan bêdeng nemînin



Hunermenda navdar a bi navê Susan Sarandon ku bi têkoşîna xwe ya ji bo mafên jinan tê nasîn û di rêxistina navneteweyî ya bi navê WITNESS'ê de xebatê dike ji bo ku balê bikêşe şîdeta cinsî ya li ser jinan banga 'bêdeng nemînin' kir... RÛPEL - 7

# Gerger: Civakek bêhiş afirandine

## Tecrîd bingeha şer ava dike

DTP'a Bazîdê têkildarî rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, civîna 1'ê kanûnê û hatina Komên Çareseriya Demokratîk û Aştî li ber avahiya DTP'ê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de endam û rêveberên DTP'ê û endamên Meclîsa Şaredariyê û endamên TUHAY-DER'ê amade bûn... RÛPEL - 4



Konfedasyona Karkerên Tirkiyeyî yên Ewropayê (ATÎK) li Ewropayê rêzepanelên bi navê 'Ji îmha û înkarê re na, wekheviyek rastîn ji neteweya kurd re' dest pê kirin. Panela yekemîn li bajarê Winterhur a Swîsreyê hat lidarxistin. Gerger jî di panelê de axaftinek kir û diyar kir ku li Tirkiyeyê civakeke bêşiûr hatiye afirandin. Gerger destnîşan kir ku gelê wî ev zêdetirî 20 salan e di bin zextên fizîkî û mavewî de têdikoşe... RÛPEL - 5

www.arsivakurdi.org



Medenî Ferho
medeniferho@hotmail.com

## Cejn û kurd

Gelê kurd, du cejn bi hev re pîroz kirin.

Yek Cejna Vejînê, yek jî Cejna Qurbanê...

Ya rastî çend sed sal in, Cejnên Qurbanê li me nayên. Di destpêka sedsala 20'emîn de, gelê kurd bû qurbanê hêzên navneteweyî… Îro, yanî di destpêka sedsala 21'emîn de jî, tê xwestin ku gelê kurd bikin qurban… Yanî qurbanên her du sedsalan dibine gelê kurd… Birahîm Pêxember jî kurd bû, êzdayî bû, ji ber zordestiya Nemrûd reviya bi çolîstanan ket. Qewmê xwe kire qurban, qewmê wî hina jî, li ber dîwaran digirî…

Zerdeştê Kal, Zend Awesta wekî Lêbeşêrîna Êzda radestî mirovaniyê kirin. Ev pirtûkên pîroz, di nava kurdan de wekî MISHEF tên naskirin. Piştî ku qurban ji destê Birahîm hate standin, hêzên zordest, pirtûkên kurdan, wekî Mishefa Reş bi nav kirin. Êzdayên dema mejî, dkevine heman şaşî û xelatiyê û dibêjin Mishefe Reş…

Yanî zora li dijî ola Êzdayî, Êzdayî jî erê dikin…

Kurdan du caran ola Îsamî ji tehlokeya têkçûnê xelas kirin. Yek Selahaddînî Eyûbî… Yek jî Eba Muslimî Xoresanî… Eba Msulimî Xoresanî bi destê misilmanan hate kuştin… Mîrateya Selahaddînî Eyûbî jî, ji aliyê Xelifeyê ku hatibû xelas kirin ve, hate talan kirin. Bi bêbextî... Du bêbextiyên li dijî kurdan hene. Yek, bêbextiya dijmin, yek jî xiyanete nava Kurdan…

Di destpêka sedsala bîstan de, hêzên bazirgan hatin Rojhilata Navîn û netewdewlet ava kirin. 22 dewlet ji ereban re, derdorê dehan li Balkanan, yek jî ji tirkan re… Para kurdan parçekirin û dîlgirtina di tara bêjingê de ket. Ne tenê parçekirina di nava çar dewletan de… Înkar jî para kurdan ket…

Dîroka Kurdan nema… Efsaneyên mîtolojîk, xwedawendên qozmîk, çîrok, destan, kultur, berhemên dîrokî, ol, civak, hişmendiya civakî li holê nehiştin. Tarûmar kirin. Di kolanên arkeolojîk de, çi berhemên dîrokî derketin holê, talan kirin. Stûn, taqên weke BAZINÊ TAQA li erdê hiştin… Medrese kilît kirin…

Gora Qeretacdîn li Newala Bûnisra xera kirin.

Nav guhertin, hiş û raman çilmisandin… Kesî nikarîbû bêje ez kurd im… Kesî nikarîbû bi zimanê kurdî biaxive… Ev hemû sedema girtin û cezakirinan bûn… Di talan û wêraniya mêjî, cografya û kesayetiya kurd de, TAHRIFATeke mezin hate çêkirin. Xiyanet neqam mezin û dijwar bû...

Gelê Kurd, evîndarê azadiyê bû û bextreşiya li dijî xwe erê nekir, dest bi serîhildanan kir. Lê, di her serîhildanê de, gelê kurd bi qasî komkujiyan bû, aqûbeta serokên serîhildanan jî, bûn sêdar. Hîna jî gorên wan nediyar in.

Herî dawî, PKK derkete holê. PKK dibin pêşengiya Ocalan de, dest bi şerê çekdarî kir... Kurdên ku di pêvajoya mirin û têkçûnê de bûn, di livîna ta mirinê de hêdî hêdî diheliyan, bixwe hatin û di qonaxa îroyîn de wekî îradeyeke siyasî derketin holê. Çi di aliyê leşkerî de, çi di aliyê siyasî de.. Bûyîneke nû, hişmendiyeke nû, dîrokek nû...

Lê car din, lîderê kurdan di destên dijmin de dîlgirtî ye... Lê car din lîderê Tevgera Azadiya Kurd, di hoy û mercên giran de, dibin tecrîda kujerî de tê girtin. Mixabin ev bextreşiya dawî jî, ji aliyê hêzên bazirgan ve hate pêkanîn.

Tevgera Azadiya Kurd, tu ziyan nedaye hêzên bazirgan û li dijî berjewendiyên wan êriş li dar nixistine.

Kurd, ji sedî 99 misilman in û bi cîhana misilman re rojî digirin, limêj dikin û berê xwe didin Hecer-ul Eswed... Her sal bi milyonan kurd diçine Heccê û ji 5 ferzên misilmantiyê, tewafa Hecer-ûl Eswed tînin cih... Fitreyên xwe didin, zekata xwe didin û her în diçine mizgeftê, bi cemaat berê xwe didine qubletê... Lê çar dewletên dagirkerên Kurdistanê, ji erd û ezman agirê kuştin û tefandinê bi ser serê gelê kurd û cografya Kurdistanê de dibarînin. Ji yek dewleta misilman, dengekî xêrê bilind nabe û nabêjin, kurd jî misilman in, kuştina li dijî wan heram e.

Lê na, kesên weke Şêx Izeddînê Filsîtînî, kuştina Kurdan helal dikin...

Dewletên xwedî hêzên bazirgan, li dijî El Başîr ku komkujiya Dafûrê pêk aniye dengê xwe bilind dikin, lê ji bo Erdoganê ku fermana kuştina zarokên Kurd û jinên Kurd dide, destek û arîkariyê dikin.

Îran her roj, Tirkiyê her roj, xaka Kurdistanê, Herêmên Parastina Medya bombarduman dikin. Kes, misilmanên kurd yên li Başûrê Kurdistanê jî di nav de, dengê xwe bilind nake. Gelo ev ne bedcanî ye?

Balkêş e, wezîrê karên hundir û koordînatorê nû yê PKKê Beşîr Atalay jî çû Heccê. Gelo, mirovê ku li dijî hebûna gelekî siyaseta red û înkarê, komkujiyên spî bidê amade kirin û rêve bibe, wê heca wî erê bibe?

Lê bavoo, desthilatdarên dagirker, nijadperestên faşîst, behişt û dojeh jî di nava xwe de parvekirine. Ji aliyekî ve nûnertiya Xweda dikin, ji aliyê din ve berdevkiya Pêxember…

Xwedê kurdan, Rêbertiya Kurdan, gerilayên kurd û tevahiya gelê kurd ji zordestên sedsala 21'emîn biparêze…

Ya rastî, min Cejna Qurbanê pîroz nekir. Ne li xwe, ne li kesî…

# 27'ê Mijdarê Cejna Neteweyî û ya Dînî ye

**Rasthatina Cejna Qurbanê û Cejna Damezirandina Bizava Gelê Kurd ku ji bo aştî û wekheviya Rojhilata Navîn têdikoşe li temamî misliman û temamî gelê kurd dê bibe wesîleya qenciyê**

KEREM SOYLU

Bi rasthatina Cejna Qurbanê bi 27'ê Mijdarê Cejna Neteweyî ya Gelê Kurd re mûcîzeyek girîng heye. Têkoşîna Hz.Îbrahîm di Rojhilata Navîn de bi dagirker û zaliman re ji bo serbestiya omet û alîkarên xwe di ol û ramanên xwe yên azad de gelek zor zext û êş elem kişandin. Dawiya dawîn jî tebat nehatê koçber bû û berê xwe da welatê ereban ku niha bûye Mekkeya Mûkerem. li wê derê ji bo azadiya olî zarokên xwe dest bi damezirandina xîmekî nû kir. Her wisa serkeftin û daxwazên wî, berê bi gorîkirina kurê xwe paşê jî Xweda (Cele Celaluhu) di berdêla kurê wî de beranek şand, têkoşîna wî ya bi salan bi dawî bû. Lê nijada Îbrahîm tim bi Dagirker û zaliman re şer kirin hin caran serkeftîbûn hin caran jî bi bin diketin. Dawiya dawîn Q'abe ket bin destê dagirkeran hetanî ku Hz. Muhemed hat û serfirazîya Netewe û Ola xwe aşkera kir.

Dema ku bi dorfirehî em li dîroka Hz. Îbrahîm û li dîroka bizava Neteweya Gelê Kurd a heri dawin mêze bikin bê guman gelek wekhevî wê derkevin pêş çavên mirov. Her wekî di mijara Qurbanê de em dikarin bêjin wek Hz. Îbrahîm çawa ku bêteredût lawê xwe di riya ol û ramana xwe de serjê dikir, her wisa jî gelê kurd li sedan egîd û lehengên xwe di riya neteweyî de kirin gorî û bê fikar didomînin. Her wekî dayikên ku zarokên wan şehîd dikevin razibûna xwe tînin ziman û dibêjin me zarokên xwe kirine gorî vê doza Neteweya Gelê Kurd.

Bi rasthatina 27'ê Mijdarê bi Cejna Qurbanê re xalek gelek girîng derkete holê ku di ola Îslamê de dema ku Cejna Qurbanê rastî roja Înê bê ew sal dibe HECIL EKBER (Heca Mezin) wê demê mucîzeyek divê rasthatinê de heye ku 27'ê Mijdarê Roja Damezirandina Bizava Neteweyî û Cejna Qurbanê bi hev û din re ku tên pîrozkirin dibe mezinahiya li ser mezinahiyê. Her wisa îsal dê bibe wesileya serkeftina gelê kurd. Ji ber van sedeman em vê Cejna Qurbanê û Cejna Damezirandina Bizava Gelê Kurd ku ji bo aştî û wekheviya Rojhilata Navîn têdikoşe li temamî misliman û temamî gelê kurd her wisa li temamî alema cîhanê pîroz dikin.

Bangewaziya me ji bawermendên ku îsal çûne Hecê her wisa Heca Mezin, bila baş bizanin ku çûyîna Hecê di hedê Zatê Xwedê de Qongreya (Komcivîna) Temamî Cîhanê ye. Temamî beş, çînî û temamî kategoriyên dinyayê ku li wê dicivin gelo nakokiyên di nav gelan de û zilm û zexta dagirkeran li ser gelên bindest di cîhanê de û bêhiqûqî û komkujiya mal, şewat û malxirabkirina wan tînin bîra xwe her wisa ji Xwedayê Mezin daxwaza çareseriyê ji pirsgirêka bindestan re dikin û ji serkeftina wan re daxwazên xwe tînin ziman.

Heke ew ji bo mezlûm û meqtûlan daya serfirazîyê û ji bo zalim û dagirkeran jî duayê wergerandinê nekin bi tenê ji bo çûyîna cenetê û dewlemendiyê duayan bikin bila baş bizanin ku Xweda (C.C) heca wan napejirîne û rastiya Îslamiyetê jî ne wek wan e.

Dibê li cem misilmanan her wisa li cem temamî olên semawî û temamî demokrat û mirovhezên cîhanê baş bê zanin ku kêşeya gelê kurd kêşeyeke neteweyî ye ya temamî kurdên cîhanê ye ji ber ku kurd di her çar parçeyên Kurdistanê de ne serbixwe ne kêşeya wan kêşeyeke neteweyî û 30 salî ye. Wê demê dibe li gorî Hiqûqa Navneteweyî ya Kurd di têkoşîn û tevgerên xwe de mafdar bin ku mafên xweyê însanî û hiqûqî biparêzin. Heke bi navê terorîstî ew bên navdayîn wê demê ew dewlet ji ber berjewendîyên xwe wê peyvê bi kar tînin.

Hêjayî gotinê ye ku di vê Roja Pîroz de mirov diyar bike ku tevgera Neteweya Gelê Kurd li gorî Qanûnên Îlahî bi taybet jî li gorî Qurana Pîroz, tevgereke meşrû ye. Ji ber ku di ber mafê gelekî ku bi zilm û zor ji holê hatiye rakirin û qedexekirin têdikoşe. Bi sedan ciwanên kurd canê xwe yên ezîz feda dikin da ku mafê xwe yên însanî yên ku bi darê zorê hatine qedexekirin, dîsa bi dest bixin. Di hinek pirtûkên olî de derbas dibe ku mademkî xweda mexlûq ji axê afirandîye wê demê ew kurê axê ne û ax jî dayika wan e. Wekî wisa ye dayîk jî namûsa herî mezin e û gelek ferz e ku mirov namûsa xwe li hemberî dagirkeran biparêze û di berdêlê de bitêkoşe û şer bike. Her wiha caîze ku mirov bê kuştin û bikuje jî.

Di vê yekê de ferziyetek olî heye ku mirov vê peywîrê pêk bîne. Heke mirov xwe ji vê têkoşînê paş ve bide, ev întihara olî û ya mirovahî ye. Hz. Mihemed jî gotiye hezkirina welatê mirov ji îmanê ye ango dema ku mirov li welatê xwe xwedî derkeve, ji êriş û dagirkirina zaliman biparêze baweriya mirov kamil e lê heke mirov li welatê xwe xwedi dernekeve li gorî Hedîsa Şerîf îmana mirov kêm e yan jî tune ye.

Di vî warîde gelek Ayet û Hedis hene lê cih dest nade ku mirov zêde binivîse.

Wekî gotina heri dawî em dikarin bi lêv bikin ku Tevgera Neteweyî ya Gelê Kurd, tevgereke neteweyî ye ne tevgera bajarekî ye yan jî ya herêmekê ye. Ew ne tevgera parçeyekî ya eşîrkî ye. Belkî ya herçar perçeyan e û ya temamî gelê kurd temsil dike Heke Başûr jî wekî Rojhilat û Rojava li bizava gelê kurd xwedi derkeve serkeftin û serfirazi dê gelek zû pêk bê.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basın Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL
Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

## Xwevekirin û çareserî

Mebest û helwesta hikûmeta AKP'ê ya di warê kêşeya kurdî de her ku diçe zelaltir dibe. Armanc ne çareseriya kêşeya kurd e, armanc şikandina îradeya gelê kurd e. AKP li pey tolhildanê ye. Rayedarên dewletê dixwest di hilbijartinên 29'ê adara 2008'an de derbeyeke siyasî li Tevgera Azadiyê bide û vê yekê bike bingeha tasfiyekirina têkoşîna gelê kurd. Lê xweşbextane gelê kurd ev hêviya wan qirika wan de hişt. Tevgera Azadiyê di hilbijartinê de serkeftineke siyasî bi dest xist.

Piştî vê yekê bernameya tasfiyekaran şikestekeke mezin xwar. Hêzên komploger ji bêgavî hinek guhartin di bernameya xwe de çêkirin. Pêvajoya ku wekî "xwevekirin"a dewleta tirk piştî vê yekê dest pê kir. Rayedarên dewletê li aliyekî lez da operasyonên siyasî û leşkerî li aliyê din jî peyva "xwevekirin" bû çîroka ser zar û zimanan. Armanca vê yekê diyar e. Ew li aliyekî bi hinek gavên zirçareseriyê, dixwazin dubendî û nakokiyan bixin nava gelê kurd, yekgirtin û hevgirtina gelê kurd qels û lawaz bikin, li aliyê din jî şîdet û zordariyê dixwazin baweriya gelê kurd a bi çareseriya demokratîk û doza azadiyê qels û lawaz bikin.

Li gorî baweriya wan dê gelê kurd piştî van polîtîkayên zirçareseriyê dev ji doza azadiyê berde, Tevgera Azadiyê jî dê li hemberî van êrîşên tund ên piralî polîtîkayên ku li ser wê têne ferzkirin bipejirîne. Li aliyê dîtir jî di ser CHP û MHP'ê re gefên qirkirinê li gelê kurd û Tevgera Azadiyê têne xwarin. Hêzên dagirker û hevalbendên wan ên navneteweyî ji bo şikandina vîn û îradeya gelê kurd polîtîkayên piralî dimeşînin. Di dema meşandina van polîtîkayan de bi hûrbînî li rewşa Tevgera Azadiyê dinêrin, li gorî vê rewşê gavan davêjin.

Di vê lêkolîn û lênêrînê de ew gihîştine wê baweriyê ku gelê kurd pir zêde polîtîze bûye, ji ber vê yekê jî wan pişaftina çandî hinekî sist kir, li şûna wê giraniyê didin pişaftina siyasî. Çima tercîheke wiha hate kirin? Mirov dikare çend sedemên vê biryarê wiha rêz bike:

*1-* Gelê kurd zêde polîtîze bûye, lewma ji divê ew rewş were guhartin. Ji bo vê yekê jî ew dikarin bi riya zimanê kurdî propagandaya dewletê hê bi hêsanî bigihînin gelê kurd.

*2-* Polîtîkayên pişaftinê êdî gihîştina asta xwepişaftinê, lewre êdî ne pêwist e ku bi rengê berê were meşandin.

*3-* Di mercên cîhanê yên îroyîn de meşandina polîtîkayên pişaftinê bi rê û rêbazên kevnare êdî ne hêsan e. Lewre jî divê li şûna van rêbazên kevnare, rêbazên nû werin ceribandin.

*4-* Di têkoşîna gelê kurd de qada herî qels a ziman û çandê ye. Dema ku mirov vê qadê û qadên din ên têkoşînê bide ber hev, mirov bi awayekî zelal dibîne ku rêxistin û sazîbûnê ya gelê kurd di warê parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de pir ne xurt e. Rayedarên dewletê wisa bawer dikin ku ew ê karibin vê qelsiyê bikin çek û li dijî Tevgera Azadiyê bi kar bînin û di warê tasfiyekirinê de encamekê bi dest bixin.

Li hemberî vê yekê tiştên ku bên kirin diyar in. Serê pêşîn divê em aliyên xwe yên qels û lawaz xurt bikin, nehêlin ku dagirker van qelsiyên me bikin bingeha êrîşên xwe. Piştî wê jî divê em derfetên ku bi van gavên dewletê pêk tên bi kar bîne û bike bingeha geşkirina têkoşînê. Ji bilî van jî divê em derfetên destên xwe de şaredarî û parlementoyê baş bi kar bînin û qadên azadiyê berfirehtir bikin.

## 'Di her tiştî de me dikin hedef'

***TERECAN UGURLU*** diyar kir ku nişka ve êrîşê dest pê kiriye û li ser vê yekê 3 zarokên xwe hildane û reviyaye mala xezûrê xwe. Ugurlu wiha domand: "Çima ev qas cudakarî heye. Ku kesekê cezayek kiribe jî lazim e daraz ceza bide. Di tiştekî biçûk de jî êdî kurd dibin hedef. Dema di navbera wan de tiştek çêdibe hiqûq lê dema bi kurdan re çêdibe lînc dest pê dike. Ji tirsan me nezanî cejn çawa derbas bû. Em nikarin ji mala xwe derkevin. Me nekarî em biçin goristanê jî. Me hewl dan malên xwe cardin tamîr bikin. Heta niha tu wezîfedar nehatine û tiştek nekirine." Talîp Demîr jî diyar kir ku dewletê wezîfeya xwe nekiriye û ev bûyer ji ber vê nijadperestiya li Tirkiyeyê zêdebûyî pêk hatiye.



# Li mexdûran lêpirsîn vekirin

**Gengaşî û fikarên piştî hewldana lîncê ya li Bayramîçê li dijî kurdan pêk hatî berdewam dike. Li navçeyê dozgeriyê li şûna der barê êrîşkaran de lêpirsînê veke, der barê mexdûran de lêpirsîn da destpêkirin**

Li bajaroka Bayramîça Çanakkaleyê kurd bi fikar in. Piştî hewldana lîcnce kurd hê jî nikarin ji malên xwe derkivin derve. Li navçeyê piştî êrîşa nijadperestan dozgeriyê mora xwe li skandaleke xist û der barê kurdan de lêpirsîn vekir.

Êrîşên li hemberî kurdan ji sala 2006'an li herêma Deryaya Reş destpêkirîn, ev demek dirêje li herêma Egeyê bi zêdebûn berdewam dikin. Ligel zêdebûna pêla nijadperestiyê, hedef nîşan dayîna, partiyên wekî CHP û MHP'ê, xwedîlêderketina Serokwezîr R. Tayyîp Erdogan a li êrîşkaran, hewildanên lînckirina k urdan jî zêde dibin. Hemû sedemên biçûk jî êdî dibin sedema lînca kurdan. Bûyerek bi kêrê birîndarkirinê ya di meha tebaxê de li Bajaroka Bayramîça Çanakkaleyê pêk hatî, çend roj berî niha bû sedema lînçkirina kurdan. 3 hezar kesên 3 roj berî niha bi hîseriyek gûrûhî êrîşî malên kurdan kir, xwest kurdan linc bike. Di êrîşan de li taxa kurd dijîn, derî û pacên malan hatin şikandin û gelek kurd birîndar bûn. Li şûna dewlet êrîşkaran bidarizîne, kurd hildan binçavan. Her wiha cardin li şûna dozgerî êrîşkaran pirsiyar bike, lêpirsîn li kurdên mexdûr vekir.

### Polîsan temaşe kir

Kurdên niha nikarin derkevin ji derve, rojên dijwar derbas dikin. Li gorî ciwanên kurd Tîmur Ozkan, Ceyhun Gormuş û Tamer Demîr dema li navenda bajarokê pevçûnek derketiye temaşe kirine. Hate ragihandin ku di dema pevçûnê de polîsan 3 ciwanên tu eleqeya wan bi pevçûnê tune, binçav kirine. Bi binçavkirina ciwanan gengaşiyê dest pê kiriye. Hate diyarkirin ku 2 rêveberên MHP'ê yên bajarokê û Cîgirê Midûrê Dibistana Seretayî ya Mîllî Hakîmiyetê H. Y. li derdorê qêrîne û îdiakirine ku kurdan êrîşî polîsan kiriye. Hate zanîn ku li ser vê yekê polîsan 3 ciwanên kurd ên binçav kirîn di nav destê êrîşkarên nijadpereste hiştine û lînc temaşe kiriye. Têkildarî mijarê Tamer Demîr agahî dan û wiha got: "Ez bi hevalek xwe re li kafeteryayekê rûniştibûm. Ji derve deng hatin. Me dît li ber otogarê du kom şer dikin. Em nêzîk pevçûnan bûn. Me nişka ve dît ku koma li wir êrîşî me kir.



Demek dirêj li min xistin. Midûriyeta Polîsan 50 metre dûrî cihê bûyerê bû lê qet nexwestin mudahaleyî bûyerê bikin. Dema polîs hatin jî li şûna êrîşkaran ez binçavkirim. Pişre polîsan li min xist. Gaza îsotê li rûyê min ki rin. Piştre cardin derî vekirin û êrîşkarên ji derve jî cardin dest bi lîncê kirin. Piştî demek wiha li min xistin, ez birim nezaretê û li vir jî gelek li min xistin. Dema ez çûbûm cihê bûyerê, pevçûn qediya bû. Pevçûn çima derketibû ez wê jî nizanim. Tu eleqeya min bi bûyerê re tune ye. Em kurd in û herkes vê yekê dizane. Cihek biçûk e. Ji ber vê yekê êrîşî me kirin. Sebeb jî polîs in. Di erebeya polîsan de jî destûr dan ku êrîşkar li me bixin."

Li ser mijarê Demîr anî ziman ku ji bo kontrolê jî nebirine nexweşxaneyê û bijîşkek gazî qereqolê kirine. Demîr wiha domand: "Doxtor tenê cihên derpkirî nivîsandin û çû. Piştre bi hinceta 'Li dijî polîsên li ser wezîfeyê derketine û bi zanîn mirov birîndar kirine' em derxistin dozgeriyê. Giliya me ya derbarê êrîşkaran de jî li ber çavan negirtin û nexistin meriyetê." Tîmur Ozkan jî heman tişt gotin û anî ziman ku bi hevalê xwe re ji bo sedema şer bizanibin çûne cihê şer û rastî êrîşê hatine.

Yazgul Çatirak ku mala wê rastî êrîşê hat, da zanîn ku nişkave dîtiye kevir li mala wan hatiye barandin û wiha pêde çû: "Me nezanî çibû. Nişkave kevir li mal bariyan. Ez, bûka min û zarokên me, me bi zorê avêtin odeya piştê. Lê heta em çûn odeya piştî tevahiya camên me hatin şikandin. Sloganên, 'Bayramîç dê bibe gora kurdan', 'Bila kurd cehnimin' , 'Ya Allah Bismillah, Allahu Ekber' diavêtin. Me lambe girtin û xwe xist pişt deriyê odeya dikeve aliyê piştê yê malê. Piştî demekê êrîşkar çûn û me jî xeber da polîs û leşkeran. Polîs rojek piştre hat." **ÇANAKKALE (DÎHA)**

## Li sînor kesek hat kuştin

Welatiyê bi navê Oktay Demîr yê li gundê Xelkavaya bi ser navçeya Elbakê ya Wanê dijî, li sînorê Îranê ji aliyê leşkerên Îranê ve hate kuştin.

Kuştina welatiyan a li sînorê Îran û Tirkiyeyê roj bi roj zêde dibin. Lê li hemberî van kuştinan heta niha hikûmeta Tirkiyeyê û rayedaran lêkolîn nekirine û dengê xwe dernexistine. Vê carê jî welatiyê bi navê Oktay Demîr ê bi îdiaya qaçaxçitiya mazotê dikir ji aliyê leşkerên Îranê ve hate qetilkirin. Cenazeyê Demir piştî otopsiya li Nexweşxaneya Dewletê ya Wanê dê li gundê Xelkavayê bê definkirin. **WAN**

## Li Ergofê terora leşkeran

Leşkerên ku dixwazin gundê Ergofa Îdirê vala bikin li gund wekî OHAL îlankirin. Çûn û hatine gund di bin kontrolê de tê girtin û erzaqên ku tên gund jî tên kontrolkirin. Serbazê bi navê Taner Çelîk ku meha borî hatiye tayînkirin ava gund desteser kiriye, gundiyan li meydana gund top kiriye û bi gotina"hûn hemû terorîst in, an hûn ê gund biterîkinin an jî em ê bi zorê bidin valakirin" gundî tehdît kiriye.

Li gundê Egofa ku 14 kîlometre dûrî Îdirê ye di 1940'an de qişleya leşkerî hate çêkirin. Ji gundiyan re hate gotin dê li navenda Îdirê cih bidin wan. Lê ev soz heta niha bi cih nehatiye. Di 19997an de jî leşkeran belgeyek bi heyeta rûspiyên gund dane îmzekirin û xwestin gund vala bikin. Gundî bi salan e bi tirsa dê gundê wan bê valakirin dijîn. Parlamentera DTP'ê Pervîn Buldanê bi pirsnameyeke ev rewş anî rojeva meclîsê. Lê biryara valakirira gund pavve nehat kişandin.

Serbazê bi navê Taner Çelîk ji bo valakirina gund rêbazên cuda dide bikaranîn. Gundiyan diyar kir ku serbaz Taner Çelîk gundî li Meydana gund top kiriye û gotiye "hûn hemû teroîst in, hûn ê gund vala bikin, heke vala nekin em ê bi zorê vala bikin."

Gundiyan diyar kir ku piştî ku Taner Çelîk hatiye gund pêkanînê wekî OHAL'ê xistiye dewreyê. Hin ji pêkanînên Taner Çelîk ev in: Ji bo drketina zozanan destûr nayê dayîn. Çûn hatina gund lê kontrolkirin û noqteyên kontrolê hatine danîn. Gundî dema ku ji gund derdikevin û vedigerin têne lêgerînkirin. Erzaqên ku gundî tînin têne kontrolkirin û piştre wan dixin gund. Şebekeya ava gund di bin kontrola leşkeran de ye. Kengî dixwazin qût dikin. Leşkerî çopên ku davêje nava gund. Gundiyên ku îtiraz dikin jî têne tehdîtkirin. **ÎDIR (ANF)**

## Ji ber teşhîsa xelet mir

Li Nexweşxaneya Dewletê ya Îdirê ku bi boneya teşhîsa xelet zarokeke jiyana xwe ji dest da, derket holê ku bijîşkên zarokan tune ye. Malbatan daxuyand ku zarokên wan li beşa lezgîniyê cardin paşve tên şandin û nayên tedawîkirin.

Li Nexweşxaneya Dewletê ya Îdirê sê roj berî niha bi mirina zaroka yek salî Narînê hate rojevê. Dayik û bavê Narînê, Fatma û Abdurrezak Kalkan daxuyandin ku keça wan ji ber teşhîsa xelet jiyana xwe ji dest daye. Piştî vê bûyerê jî malbatên zarokên xwe dibin Beşa Nexweşiyên Zarokan û Welidînê ya Nexweşxaneya Dewletê ya Îdirê bi boneya bijîşkên zarokan tune ye, li berşa lezgîniyê tedawiyek li ser piya tê kirin û malbat paşve tên şandin. Metîn Ozturk ku zaroka wî nû ji dayik bûye û ji ber nerihetiya wê aniye nexweşxaneyê, anî ziman ku ji ber tunebûna bijîşkek pispor nikare zaroka xwe tedawî bike û wiha axivî: "Ji ber ku rewşa me ya aborî nebaş e em nikarin bibin nexweşxaneyên taybet jî. Min zaroka xwe bir nexweşxaneyê. Lê ji ber tunebûna bijîşk wan ji min re got an here acilê an jî here malek tenduristiyê. Gelek zarokên bi boneya şewba berazan tên şandin, nayên tedawîkirin. "

Hacer Karasu ku zaroka xwe ji ber kelijandina bilind razand nexweşxaneyê derbirî ku ji ber tunebûna bijîşkê pispor ew şandine beşa lezgîniyê. Karasu got kulazim e ji bo vê yek ê çareyek bê peyda kirin. Veynep Voral jî da zanîn ku ne ew ne zarokê wê ji ber tunebûna doxtorên pispor nayên tedawîkirin. Serbijîşkê Nexweşxaneya Dewletê ya Îdirê Cesîm Guneş diyar kir ku Wezareta Tenduristiyê hewceyiya bijîşkan a nexweşxaneyê dizane lê hêj bijîşk neşandine. **ÎDIR**

## 'Ez nabêjim bila welat sax be'

Bavê leşkerê bi navê Sedat Horoz ku di 25'e mijdarê de li Şirnexê bi îdîaya 'întihar kiriye' jiyana xwe ji dest da Zemçî Horoz, diyar kir ku ew bawer nake kurê wî întihar kiriye û bûye qurbanê kuştinê.

Li Şirnexê di 25'ê mijdarê de leşkerê bi navê Sedat Horoz ku eslê xwe ji bajaroka Bulam a Semsûrê ye û li Edeneyê dimîne bi îdiaya "întihar kiriye" jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Sedat Horoz di roja Cejna Qurbanê de birin Edeneyê û teslîmî malbata wî kirin. Malbata Horoz xwest cenazeyê kurê xwe li Goristana Şehîtlikê defin bikin, lê leşkeriyê destûr neda û piştre birin li Goristana taxê defin kirin. Malbata Horoz, têkildarî kuştina kurê xwe li taxa Dumlupinar a Edeneyê daxuyani da çapemeniyê. Serokê Navenda Çandê ya Pîr Sultan Abdal ya Edeneyê Metîn Çelîk, diyar kir ku di demê dawî de kuştina leşkeran a bi guman zêde dibe û wiha got: "Her tim bi gotina 'qeza' ango 'întihar'ê cenazeyên zarokên me tên." Çelîk, anî ziman ku ji bo xwîn rawest e divê her kes têbikoşe û li hemberî van kuştinan dengê xwe bilind bikin.

Bavê Sedat Horoz Zemçî Horoz jî diyar kir ku kurê wî bûye qurban û wiha got: "Dibêjn kurê te întihar kiriye. Ez qet bawer nakim. Ji ber ku tu sedema întihar bike tunebû. Pir ji xwe û jiyanê hez dikir. Rayedarên leşkeriyê têkildarî sedema kuştina kurê min agahî nedan min. Ez bi şik û guman im."

Li ser navê malbatê Gursel Çalgan daxuyanî xwend û diyar kir ku rojek piştî kuştina Horoz ew hatine agahdarkirin û wiha got: "Me got em ê bên cenaze bibînin. Lê dîsa cenaze birin Amedê. Wekî agahiya pakêtekê bidin me em agahdar kirin. Gelo çi ji kê vedişêrin. Pêwist e têkildarî sedema întiharê me agahdar bikin. Rayedarên leşkeriyê gotin li benda encama otopsiyê bisekinin. Dixwazin şopa kuştinê winda bikin. Di nava leşkeriyê de hin kesên li dijî kurd û elewiyan hene. Ev yek bi kuştinên berê jî hatiye îspatkirin. Ji bo bûyer ronî bibe em ê heta dawî bişopînin."

Bavê leşkerê bi navê Volkan Kamalak ku mehek berê li navçeya Dêzkanê ya Agirî bi îdiaya 'întihar kiriye' jiyana xwe ji dest dabû Hayrî Kamalak jî axivî û diyar kir ku kurê wî jî bi heman hincetê hate kuştin û ew bawer nake kurê wî întihar kiribe. Kamalak jî bertek nîşanî helwesta rayedarên leşkeriyê da û wiha axivî: "Ez nabêjim bila welat saxbe. Ez naxwazim ku zarokên min ên din jî fade bibin. Welat û al li şûna xwe sekinîne, lê zarokên me têne kuştin. Piştî me got em dê dozê vekin, rayedarên leşkeriyê bi çavê dijminantiyê li me dinerin. Ez vê helwesta wan şermezar dikim. Piştî riyê hikûqî li Tirkiyeyê xetimîn ez dê serî li DMME'ê bidim."

Parêzerê malbatê Kemal Derîn jî anî ziman ku ji ber derbarê kuştinê de malbat nehatiye agahdarkirin û ronîkirin gumana kuştinê zête bûye. Derîn, destnîşan kir ku ew dê dozê bişopîne. **EDENE**

## Tecrîda Îmraliyê li Stenbolê hate şermezarkirin

Girankirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di pîrozbahiya 31'emîn salvegera damezirandina PKK'ê de hate şermezarkirin.

Di pîrozbaniyên 31'emîn salvegera damezirandina PKK'ê de girankirina şert û mercên tecrîdê yên li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan hatin şermezarkirin. Pêr şevê din komek ciwanan li navçeya Eyûbê bi hatin cem hev û li ser rewşa siyasî ya dawî nirxandin kirin. Ciwanên têbiniyên hevdîtina bi Ocalan re xwendin, damezirandina PKK'ê wekî serhildan û vejîna gelê kurd nirxandin. Ciwanên piştî civînê daketin kolanan, alên PKK û Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan vekirin. Ciwanan sloganên, "Bijî Serok Apo", "Bêyî Serok jiyan nabe" û "Nêzîkatiya li hemberî Ocalan sedema me ya şer û aştiyê ye" avêtin, demeke dirêj meşiyan. Rêveberê Rêxistina DTP'ê ya Bajar a Stenbolê Latîf Kara ku piştgirî da ciwanan û da zanîn ku bi girankirina tecrîda li ser Ocalan pirsgirêk çareser nabin û dê kûrtir bibin. Kara anî ziman ku Ocalan lîstikên pergalên yên îmhakirina kurdan pûç derdixe û ji ber vê yekê tecrîda li ser Ocalan ji bo tolhildanê tê girankirin. STENBOL

# 'Şert û mercan' sererast bikin!

**Rewşenbîr û siyasetmedaran bal kişand ser tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tê meşandin û xwestin ku heyetên serbixwe li Îmraliyê vekolînê bikin. Hate xwestin ku di zûtirîn demê de şert û mercên Îmraliyê bên sererastkirin û daxwaza guhertina cihê Ocalan hate kirin**

Piştî bihîstina têkildarî girankirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nerazîbûna gelê kurd zêde dibe. Rewşenbîr û siyasetmedaran bal kişand ser tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tê meşandin û xwestin ku heyetên serbixwe li Îmraliyê vekolînê bikin. Rewşenbîran xwest ku di zûtirîn demê de şert û mercên Îmraliyê bên sererastkirin.

**Bila heyet biçe Îmraliyê**

Parêzvanê mafên mirovan Şanar Yurdatapan bi bîr xist ku Ocalan diyar kiriye şert û mercên wî yên berê baştir bûne û wiha got: "Niha rewşa wî xirabtir kirine. Lazim e Ocalan jî li cihek li gorî şert û mercên mirovîn bê cihkirin. Qesran naxwaze. Gelek tiştek maqûl dixwaze. Lazim e dewlet vê yekê bi cih bîne. Elbette divê em şert û mercan di cih de bibînin. Ji bo vê pêwist e heyetek çavdêr biçe Îmraliyê û vekolînê bike."

**'Divê ev daxwaz bi cih bên'**

Nivîskar Ertugrul Kurkçu diyar kir ku lazim e ev mesele nebe meseleya metrekareyê û wiha domand: "Tiştek niha pirsgirêk têkiliya wî ya bi parêzeran, cîhan û mirovan re ye. Wisa xuyaye ku guherînek şeklî hatiye kirin. Dirastiyê de tiştek nehatiye başkirin. Daxwaza heyî gelek maqûl e û şert û mercên wekî mirovan tên xwestin. Lazim e ev şert û merc bên sererastkirin. ev qas tişt kirin, mesref kirin û diviya encam ne ev biya. Bila nekirana. Vegerandine eziyetekê. Ev yek nayê qebûlkirin. Pêwistek ev daxwazên başkirina şert û mercan bi cih bên."

**Gotinên hikûmetê bê wate ne**

Berdevkê Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê Hakan Tahmaz diyar kir ku banga şandina heyetek serbixwe ya Îmraliyê kirine û wiha pêde çû: "Divê heyeke serbixwe biçe li girtîgehê vekolînê bike. Divê di encama lêkolînan de rewşa zelal derxe holê.

Li ser banga CPT'ê şert û merc hatine gunerandin lê niha xirabtir e. Gotinên hikûmetê di vê rewşê de watedar nîne. Hewceyî bi lêkolîna heyetek serbixwe heye. Pêwiste ev yek jî di zûtirîn demê de bi cih bê. Bila heyetên serbixwe li ser mijarê raporan amade bikin. Ev tişt rast bin, lazim e di zûtirîn demê de şert bên başkirin."

**'Divê sererastkirin bên kirin'**

Serokê Giştî yê EMEP'ê Levent Tuzel jî diyar kir ku di encama zordariya Yekîtiya Ewropayê de sererastkirinek henekî hatiye kirin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ev nîşaneyek polîtîkaya AKP'ê ya durû ye. Dengvedana hewildana demokratîk a li Îmraliyê ye. Hewceye Îmralî bê girtin û azadiyên siyasî bên dayîn. Pêwiste îktîdar van daxwaza bi cih bîne." STENBOL (DÎHA)

## 'Tecrîda li dijî Ocalan egera şer û aştiyê ye'

***DTP'a*** Bazîdê têkildarî rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, civîna 1'ê kanûnê û hatina Komên Çareseriya Demokratîk û Aştî li ber avahiya DTP'ê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de endam û rêveberên DTP'ê û endamên Meclîsa Şaredariyê û endamên TUHAY-DER'ê amade bûn.

Li ser navê komê Serokê Rêxistina DTP'ê ya Bazîdê Zekî Çamlibel, daxuyanî xwend û diyar kir ku ew di aştiyê de israr dikin. Çamlibel, destnîşan kir ku li gel biryara PKK'ê ya bêçalakiyê dîsa hikûmeta AKP'ê di şer û operasyonan de israr dike. Çamlibel, da zanîn ku gelê kurd ji bo aştiyek mayinde çi ji destê wî tê dike, lê hikûmeta AKP'ê polîtîkayê çewsandin û perçekirinê dimeşîne. Çamlibel, bal kişand ser nexşeriya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û wiha got: "Di vê pêvajoya ku heviyên aştî û demokrasiyê pêş dikevin, li şûna ku hikûmeta AKP'ê şert û mercên Rêberê PKK'ê Birêz Abdullah Ocalan baş bike, li aliyekî dest datîne ser nexşeriya Ocalan, li aliyekî tecrîda li ser Ocalan girantir dikin. Tecrîta li dijî Ocalan bingehê şer ava dike. Ev yek rê li pêşiya çareseriyê dixetimîne." Çamlibel, bang li hikûmetê kir û xwest berî her tiştî operasyonan bi dawî bike û destê kurdan ên aştiyê li hewa nehêle.

Çambibel, bang li welatiyên Bazîdê jî kir û xwest komên aştiyê pêşwazî bikin û beşdarî civîna gel ku di 1'ê kanûnê de pêk bînin bibin. Piştî daxuyaniyê ji bo beşdariya civînê û pêşwazîkirina komên aştiyê 5 hezar belavok li nava gel û esnafan belav kirin. AGIRÎ

# Gerîlayan 27'ê Mijdarê pîroz kir



Erdal HAKKARÎ - BEHDÎNAN / ANF

Pîrozbahiyên 31'emîn salvegera damezirandina PKK'ê li Qadên Parastinê yên Medyayê didomin. Gerîlayên HPG û YJA-STAR'ê bi mebesta 31'emîn damezirandina PKK'ê li Qadên Parastinê yên Medyayê bernameyên pîrozbahiyê li dar xistin. Bi sedan gerîla û gelek serleşkerên gerîlayan beşdarî pîrozbahiyê bûn.

Pîrozbahî, piştî deqeyeke rêzgirtina ji bo şehîdên azadiyê dest pê kir. Endamê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Bozan Tekin derbarê salvegera damezirindina PKK'ê axaftinek kir û wiha axivî: "Îro, hem ji bo Kurdistanê û hem jî ji bo Rojhilata Navîn, rojeke dîrokî ye. PKK, ji bo jiyaneke bi rûmet, ji gelê kurd re bûye deriyeke xelasiyê."

Tekin dest nîşan kir ku desthilatdar her tim dixwazin îradeya kurdan tune bikin û wiha pê de çû: "Geleke bêîdeolojî, geleke bêmejî û ziman e. Hêzên desthilatdar her tim dixwazin gelê kurd bêrêber bimîne. PKK vê rêberitiyê kiriye û gelê kurd jî hatiye wer asteke ku dikare rêberiya mirovahiyê bike. Bila hemû dijminên me baş bizanibin. Ew çiqas bi ser gelê me û Serokatiyê me de herin jî nikarin me tune bikin. Bila hemû gelê me zanibe ku ji her tim zêdetir nêzîkê azadiyê ne." Piştî merasîmê, bi sedan gerîlayan agiran vêxistin û li dora agir bi saetan dîlanê girtin.

# 72 sal in bi birîna Dêrsimê dijî

Di ser hildana Dêrsimê re 72 sal derbas bûn. Her çiqas 72 sal di ser bûyerê re derbas bibin jî kesên bûne şahidên wahşeta wê demê gav bi gav vegotin û dîsa bûyer li ber çavan zindî kirin. Şahidan diyar kir ku wê demê mirov di odeyan de kom dikirin û didan ber keleş û çekên otomotîk û gulebaran dikirin, piştre davêtin çal û koncalan. Bago Polat got 'min destê xwe da ber serê xwîşka xwe. Em hatin gulebarankirin. Guleyek bi serê xwîşka min ket. Serê wê parçe parçe bû. Heman guleyê du tiliyên destê min ê rastê jî jê kirin'.

**'Ez avêtim çemî'**

Kalê 82 salî Huseyîn Gul, serpêhatiya komkujiya Dêrsimê ya sala 1938'an wiha vegot: "Leşker hatin gund û kî diket ber wan dikuştin. Leşker piştî hatin gundê me Demenanê em ji gund reviyan. Gund şewitandin. Piştre leşker hatin gundê Kavun û gotin gundiyê Demenan di nava we de hene? Wê rojê leşkeran nêzî 40 kesên Demanan ku zarok û jin jî di nav de kom kirin û birin. Em birin rûbaroka Harçîk û li wir em dan ber guleyan. Gule li me barandin" Gul, anî ziman ku gule wekî baranê bi ser wan de dibariyan û wê demê ew ji zendik, pişt û milê xwe de birîndar bû. Gul, serpêhatiya xwe wiha vegot: "Em êvarî tev kom kirin û birin rexê çem û em dan ber guleyan. Dema ez birîndar bûm min xwe avêt erdê û wekî miriyan raketim. Leşker hatin kesên kuştin tev avêtin bin kevir û latan. Ez jî avêtim nava avê. Ji bo ez di nava avê de nefetisim min li ber xwe da. Ez nêzî 200 metreyî ber bi avê çûm. Piştre min xwe bi kevirekî nava avê girt û ez derketim ser kevir. Ez derketim ser kevir û rawestiyam. Hîn dengê teqîna guleyan dihat."

Gul, da zanîn ku dema ew li ser kevir rawestiyabû birîndarekî din di nava avê de di cem wî re derbas bû. Gul, anî ziman ku dema wî destê xwe dirêjî kesê birîndar kir, wê demê birîndar jî destê xwe dirêjî wî kir û ji nava avê derxist. Gul, serpêhatiya xwe wiha got: "Piştî min ew ji nava avê derxist û kişand ser kevir. Min dît ku xaltiyê min e. Ew jî wekî min 10 salî bû. Bi giranî birîndar bibû. Ji serê xwe, milê xwe û sînga xwe birîndar bibû. Em çûn bin dareka biyê û heta sibê man. Heta 4 rojan me xwarin nedît. Me tenê av vexwar. Piştî roja 4'an xaltiyê min mir."

**'Bavê min bi darve kirin'**

Jina bi navê Beser Gul ya di sala 1924'an hatiye dinê û niha 87'ê salî jî wiha got: "Ez wê demê 14 salî bûm. Em wê demê li Gome Derweşê dijîn yê navê wê yê niha taxa Esen Tepe. Leşkeran bavê min gazî kir qereqolê. Bavê min çû qereqolê, piştre jî me tu agahî jê negirtin. Birayên min ji bo agahiyekê bigirin çûn qereqolê. Wê demê leşkeran gote biryarên min 'Bavê we li qereqolê darve kirin, neçin dê we jî darve bikin'."

**'Malbata min qir kirin'**

Welatiyê bi navê Bago Polat yê di sala 1928'an hatiye dinê û niha 82 salî ye jî wiha got: "Wê rojê leşker hatin gund nêzî 30, 40 kes ji gund birin. Leşkeran gote me 'Em ê we koçber bikin'. Me digot dê me bibin koçberiyê, em ketin pêşiya wan. Em birin herêma Taxteqalê ya li ber ava Harçîkê. Êdî dinya tarî dibû, li hemberî me 4 çekên otomatîk ên giran danîn. Piştre jî em hemû gulebaran kirin. Di dema gulebarandinê de dayik, bav, 2 xwîşkên min û birayê min hebûn. Min destê xwe danîbû ser serê xweşîka xwe. Gule bi serê xwîşka min ket û serê wê parçe parçe kir. 2 tiliyên min ên destê min yê rastî jê kirin û ez ji ser hişê xwe çûbûm." Polat, anî ziman ku ji malbata wî tu kes najî û wê rojê hemû malbata wî hate qetilkirin.

Polat, destnîşan kir piştî gulebarandinê leşkeran hemû cenaze bi kêrên çekan kontrol kirin ka kesek dijî an ne. Polat, bilêv kir ku leşkeran hemû cenaze avêtin avê û wekî ew jî miriye avêtin avê û wiha domand: "Wê rojê ji bilî min û Huseyîn Gul tu kes sax nema. Piştre me xwe ji avê xilas kir û em çûn çiya. Em çûne cem kesên li çiyayan ber xwe dikin. Em bi wî şeklî xilas bûn. Piştî efû derket em vegeriyana bajar. Dewletê hemû kes qetil kir û niha jî înkar dike. Tiliya Ataturkî jî di nav de bû. Digotin Ataturk nexweş bû lê ez bawer nakim. Dema ku rayedarekî dewletê bê ez dê însanên me çawa qetil kirine hemûyan yek û yek nîşan bidim." DÊRSIM (DÎHA)



Beser Gul — Huseyîn Gul

# 'PKK bi armanca azadiyê ava bû'

**Ji damezrînerên PKK'ê Ali Haydar Kaytan anî ziman ku PKK bi armanca afirandina jiyaneke alternatîf ava bûye û got cewherê felsefeya Apocî, 'heke dê jiyan hebe divê azad be yan jî dê qet nebe' ye**

Demhat TOLHILDAN - QENDÎL / ANF

Ji damezrînerên PKK'ê Alî Haydar Kaytan bi mebesta 31'emîn salvegera damezrandina PKK'ê axivî û anî ziman ku PKK li ser xîmê jiyaneke azad hatiye avakirin. Kaytan wiha got: "Rêber Apo ev jiyan red kir û li Kurdistanê felsefeya têkoşîn û jiyanê pêş ve bir."



Ji damezrînerên PKK'ê Alî Haydar Kaytan got ku Tevgera Azadiya Kurdistanê rê li ber pêşveçûna ciwanên Kurdistanê vekiriye û wiha got: "Gelê kurd ligel PKK'ê dît ku tûne bûn ne qeder e." Kaytan derbirî ku PKK'ê felsefeya têkoşînê afirand û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Dîroka mirovatayê, li hemberî pergala şaristaniyê dîroka lehengiyê ye." Kaytan got, dema mirov hûr û kûr bifikire, dê bibîne ku bê felsefe nabe. Ji ber hindê jî divê felsefeyê wekî zanistiyê heqîqetê qebûl bike.

**'An azadî an jî qet'**

Kaytan li ser felsefeya Ocalan rawestiya û anî ziman ku Tevgera Apocî li ser bingehê nêrîneke nû ya ji bo jiyanê ava bûye û wiha got: "Cewherê felsefeya Apocî, 'divê jiyan di ser her tiştî re bê girtin, heke dê jiyan hebe divê azad be yan jî dê qed nebe'. Ev esas e."

Kaytan nêrîna Ocalan a ji bo mirovahiyê wiha anî ziman: "Rêber Apo, dibêje 'heke di mirovekî de bi qasî tayekî mû îşareta ji bo jiyanê hebe divê ew mû bê girtin û vegera wî ya ji bo jiyanê pêkan bibe'.Ev helwest, felsefeya Rêber Apo ya ji bo jiyanê vedibêje." Kaytan pirsa azadî bi çi pêkan e? kir û anî ziman ku ev pirs mirov ber bi vekolîna heqîqetê ve dibe.

**Azadî bû rastiya jiyanê**

'Rêbertiyê me felsefeya civaka kurd lêpirsî û hewl da ku civaka kurd ji rewşa ku tê de bû derbixe'. Kaytan di dewama gotinên xwe de anî ziman ku Tevgera Azadiyê hêmaya azadiyê ji asta xeyalbûnê derxist û veguherand rastiyeke jiyanê.

Kaytan li ser perspektîfa Ocalan a ji bo dewletê jî rawestiya û got ku Ocalan dewletbûnê wekî dûrketina ji rastiya civakî dinirxîne û wiha got: "Rêbertiya me dibêje, 'Paşroja mirovatiyê rasttir e. Ez ê li wir li mirovatiyê bigerim, bigirim û ji nû ve bidim destpêkirin. Pêşeroj ji pêkhatina vê rastiyê wêdetir tiştekî din nîn e'. Ev jî tê wateya dan û standineke rast a bi rih û rîcikên xwe re."

Kaytan anî ziman ku PKK derveyî dewletbûnê hewldana ji bo afirandina civaka azad e.

## Banga ji bo CPT û DMME'yê

**KOMÎTEYA Tenduristiyê ya Koma Civakên Kurdistanê (KCK) têkildarî rewşa tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyaniyeke nivîskî weşand û got divê CPT û DMME'yê ji bo sererastkirina şert û mercên Ocalan berpirsiyariya xwe bi cih bîne.**

**Komîteya Tenduristiyê ya KCK'ê anî ziman ku nebaşbûna pirsgirêkên tenturistiyê yên Ocalan fikarên wan zêde kirine û wiha got: "Bi salan e dîlgirtina Rêbertiya me didome, her wekî giranbûna şert û mercên tecrîdê têr nedikirin, niha jî bê tevger û bê hewa hatiye hiştin. Ev bi tenê bê hiqûqiya saziyên têkildar nîşan nade, di heman demê de bê wijdaniya wan jî nîşan dide."**

**Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Di rewşeke ku li tevahiya Tirkiyeyê 'berlêvekirina çareseriya demokratîk' tê axaftin de hikûmte ango dewlet; hewl dide ku Rêbertiya me hewa jî negire. Ev jî nişan dide ku samîmiyeta wan a ji bo çareseriyê nîn e."**

**Komîteya Tenduristiyê ya KCK'ê anî ziman ku Komîteya Pêşîlêgirtina li Îşkenceyê (CPT) ya Konseya Ewropaye û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) raste rast ji vê rewşê berpirsiyar in û ev bangewazî kir: "Li ser vî esasî ji saziyên tekildar dixwazin şert û mercên Ocalan demildest bêne sererastkirin û di vî warî de berpirsgiyariya xwe bînin cih. Her wiha bangî welatparêzên li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat dijîn, bangî hemû demokrat û kurdistaniyên nojdar dikin ku li her derê bikevin nava liv û tevgerê û nerazîbûna xwe bînin ziman."** BEHDÎNAN (ANF)

# 'Civakeke bêşiûr hat afirandin'

Alî OZŞERÎK - ZURÎH

Konfederasyona Karkerên Tirkiyeyê yên Ewropayê (ATÎK) li Ewropayê rêzepanelên bi navê 'Ji îmha û înkarê re na, wekheviyek rastîn ji neteweya kurd re' hat destpêkirin. Panela yekemîn li bajarê Winterhur a Swîsreyê hat lidarxistin. Gerger jî di panelê de axaftinek kir û diyar kir ku li Tirkiyeyê civakeke bêşiûr hatiye afirandin.

Parlamenterê DTP'ê yê Amedê Selahattin Demîrtaş, Lêkolîner-Nivîskar Haluk Gerger û Serokê ATÎK'ê Musa Demir jî wekî panelîst beşdar bûn.

**Ferzkirina tirkbûnê**

Gerger destnîşan kir ku gelê wî ev zêdetirî 20 salan e di bin zextên fizîkî û manewî de têdikoşe û wiha axivî: "Di şer de hem kurd û hem jî tirkan bedêlên giran dan. Saziyên ku çavkaniya demokrasiya Tirkiyeyê dikin jî êdî riziyan. Civakeke ku bêşiûr hat afirandin."Gerger, bal kişand ku li Tirkiyeyê gelek rewşenbîr û hunermend piştgirî didin pergala milîtarîst û nijadperest. Haluk Gerger anî ziman ku mafê gelê kurd heye ku pêşeroja xwe bi xwe ava bike û wiha pê de çû: "Dixwazin her kes bêje 'Bextewarî ji wî re yê bêje ez tirk im'. Ev yek ji xwe bingeha pirsgirêkê ye. Tirkiye bi parastina xêzên xwe yên sor nikare vê pirsgirêkê çareser bike."

**Îradebûna gelê kurd**

Parlamenterê DTP'ê yê Amedê û Wekîlê Serokê Koma Parlamentoyê ya DTP'ê Selahattîn Demirtaş jî dewlet ji bo demeke bigire piştgirî dide AKP'ê lê bi tasfiyekirina PKK'ê ev pirsgirêk nayê çareserkirin û wiha lê zêde kir: "Di hilbijartina 29'ê Adarê de dewlet û DTP bi hev re ketin pêşbirkeke. Encamên hilbijartinan derxistin holê ku gelê kurd îradeya xwe ya nûnertiyê dide kê. Hatiye fêmkirin ku PKK li pêşiya Projeya Nû ya Rojhilata Navîn astenga herî mezin e û êdî tu kes nikare bi çekdarî PKK'ê tasfiye bike. Ji ber vê yekê jî xwestin ku bi 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' gelê kurd bixapînin û ji PKK'ê dûr bixin. Di parlementoya Tirkiyê de çar partiyên xwedî kom hene. Lê mixabin ji bilî me hemû partî dixwazin vê pirsgirêkê bi tasfiyekirina PKK'ê çareser bikin. Ji ber vê yekê jî ji bo ku wekî kesên ji çareseriyê direvin neyên xuyakirin li her derê bi hemê hêza xwe dixebitin. Em li her derê dibêjin ku 'Açilimeke' li ser tasfiyekirina PKK'ê hatiye plankirin, bi ser nakeve."

Demîrtaş dest nîşan kir ku berî her tiştî divê dewlet bi paşeroja xwe re rûber bibe û heke paşeroj neyê darizandin pêşeroj bi ser nakeve û wiha got: "AKP'ê bi girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, niyeta xwe ya rastrîn derxistiye holê. Ji bo naveroka vê pêvajoyê bê tuje kirin û aştiyeke mayînde pêk bê, çi ji destê me bê em dê bikin û bi ser kevin."

**Armanca tasfiyekarî ye**

Serokê ATÎK'ê Musa Demir jî anî ziman ku ji afirandina Komara Tirkiyeyê vir de, di çerseriyê der her tim polîtîkayên îmha û înkarê hatiye bi kar anîn û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Her dem tasfiyekirina tevgera kurd hatiye fikirîn. Edî hatiye fêm kirin ku Tevgera Azadiya Kurd bi şerê çekdarî nayê tasfiyekirin û niha jî dixwazin bi 'berlêvekirina çareseriya pirsgirêka kurd' îradeya gelê kurd tasfiye bikin. Bêgûman em bawer dikin û piştgirî din ku mafê gelê kurd heye ku pêşeroja xwe, bi xwe biafirîne. Ev pêvajo wekî wekî polîtîkayeke dewletê tê bi pêş xistin. Armanc, tasfiyekirina PKK'ê ye û DYA ji bo vê piştgiriyê dike."






Adil Zozanî
a_zozani@hotmail.com

## 'Vegera' ji Îmraliyê

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji hucreya 6 metrekareyî ya Îmraliyê bangî gelê kurd kiriye: **Ev 11 sal in, li vir her roj min dikujin. Gav bi gav min ber bi mirinê ve dibin.**

Li ser van gotinan gelek fikirîm. Ev gotin tên çi wateyê? An jî wateya van gotinan ji bo me çi ye?.. Pirs li pey hev tên û pirsa dawî: Dewleta tirk dixwaze çi bike?

Şanazî û serbilindiya gelê kurd a salên dawî hate bîra min. Gelê kurd, di dîroka xwe de yekemîn car e ku ji bo azadiyê ev qas bi xwe bawer e. Bi vê baweriyê dadikeve qadan û bê tirs daxwaza xwe ya ji bo azadiyê tîne ziman.

Wêneyê dawî yê vê tabloyê di vegera Komên Aştiyê de li Xabûrê hatibû jiyîn. Pêşwazîkirina gerîlayan û penaberên doza azadiyê, hilma hestên azadîxwaz a gelê kurd bû. Ev hilm û têhn bi mebasta bangawaziya rêzdar Ocalan pêk hatibû. Dewleta tirk li Xabûrê wêneyê gelê kurd ê şîfreyên azadiyê tê de nixumandî, dît. Tirsiya û tirsa xwe ya ji bo kurdê azad demildest dehrî kir. Piştre jî teyîsînin vê dehrîkirinê em bînin û dixwînin.

Bînin bîra xwe; rêzdar Ocalan ji hucreya xwe ya 12 metrekareyî bangewaziya şansdayîna ji bo pêvajoyê çareseriyê kiribû. Gelê kurd di asta herî bilind de bersiv da bangewaziya wî. Dewleta tirk ji serokomar, serokwezîr û heta serokên partiyên muxalif tevan bi yek dengî kêlbên xwe li hemberî gelê kurd derxistin.

Heta niha bi sedan carê hatiya gotin... Ez jî careke din bêjim: Dewleta tirk ji kurdê azad hez nake. Kurdê herî baş, kurdê xizmetkar e. Di dîrokê de bav û kalên wan gelek caran ev hesta xwe dehrî kiriye. Îro jî teyîsîna vê dehrîkiriyê heye.

Ji ber hindê ye ku li ser navê sistkirina tecrîda li Îmraliyê, tecrîd pirtir hatiye şidandin. Dewleta tirk piştî wêneyê Xabûrê dîtî, dizane ku gelê kurd; bawerî bi 'vegera' ji Îmraliyê aniye. Ev dizanin û dewlet jî dizane. 'Vegera' ji Îmraliyê, azadiya kurd û Kurdistanê ye. Avakiriya jiyaneke azad û mînak e.

Mînaka ji bo jiyaneke azad e; lewre her kurdekî hinekê hestên ji bo jiyaneke azadîxwaz di dilê wî de jînewer in; bawerî bi xwe aniye. Ev jî li dewleta tirk nayê.

Mînaka ji bo jiyaneke alternatîf e, ev jî kêrî hêzên ku ranta cîhanê dixun nayê.

Rêzdar Ocalan dibêje, 'Li Îmraliyê rola dergehvaniyê dane Tirkiyeyê'. Û tîne ziman ku pergala Îmraliyê ji aliyê Amerîka, Ingilistan, Israîl û Yekitiya Ewropayê ve hatiye sazkirin û parastin.

Di notên hevdîtinê yên hefteya dawî de rêzdar Ocalan vê hevokê bi kar tîne: Kesayetiyeke din nîn e ku hezên navneteweyî ev qas li ser dilîzin. Sedemek ji bo vê yekê heye. Yên sedemê vê yekê baş hîn bibin, pêşniyara min ew e parêznameyên rêzdar Ocalan ên dihatine qedexekirin bixwînin.

Hêzên navneteweyî dibînin ku gelê kurd ligel ku pirên xwe yên ji bo azadiyê avakirine, di heman demê de xîmê jiyaneke alternatîf a mînak jî daniye. Ev jî bi kêrî wan nayê.

Çawa dewleta tirk dixwaze bi kurdê teslîmgirtî re tevbigere, hêzên navneteweyî jî naxwaze bi kurdekî ramanazad re tevbigere. Rê li ber kurdên ramanazad digere.

Niha jî vê pirsê ji xwe bikin: **Dewleta tirk ji çi ditirse?**

Bersiv pirsê beriya ku pirs bê kirin hate dayîn.

Gelê kurd bawerî bi 'vegera' ji Îmraliyê aniye?

Du bijare li ber me ne. Yan em ê ji bo 'vegera' ji Îmraliyê, di navbera Amed û Îmraliyê de pira azadî ava bikin. An jî dewleta tirk dê tovê me biqelîne û hestên me yên azadîxwaz dê heta heta bikuje. Ez bangewaziya rêzdar Ocalan a 'Gav bi gav min ber mirinê ve dibin' wisa fêm dikim.


## Ser diçe lê fêl naguhere!



*Hikûmeta AKP'ê bi bîlboardên ji bo pîrozbahiya cejna Qurbanê feraseta xwe ya ji bo gelê kurd careke din nîşan da. Bîlboardên li Amedê hatine daliqandin, hişmendiya Erdogan a 'yek al, yek dewlet, yek milet, yek ziman vedibêje'. 2 bîlboardên AKP'ê yên ku li Amedê hatine daliqandin wekî nîşaneya înkara nasnameya gelê kurd bûn. Li ser yekê 'Tîrêjên hîv û stêrê têrî me tevan dikin', li ser a bîlboarda din jî 'li dera ku lê biheji ne tirs heye ne jî keder' hatiye nivîsandin. Wêneyê Erdogan li ser ala Tirkiyeyê hatiye montajkirin û ev du hevok li ser hatine nivîsîn û di binê wê de jî gotine; 'Cejna we ya Qurbanê pîroz be'... Bîlboardên AKP'ê 'ser diçe fêl naguhere' anî bîra mirov.*

# HRW: Sûriye îşkencekar e

**HRW'ê zext û zora Sûriyeyê ya li ser gelê kurd bi rapoekê aşkera kir û pêşniyarên balkêş kirin. Her wiha li girtîgeha Edra ya Şamê greva birçîbûnê ya girtiyên kurd ket roja 32'yan**




Kurdên Başûrojavayê Kurdistanê ji ber zext û zora dewleta Sûriyeyê bêzar bûne. Herî dawî girtiyên kurd yên Edrayê ji ber îşkence û nedayîna hin mafên xwezayî yên wek radyo, TV û hevdîtina bi malbatên xwe re roja 30'ê cotmehê dest bi greva birçîbûnê kirin. Greva girtiyên kurd yên girtîgeha Edraya Şamê ket roja 32'yemîn.

Li ser rewşa kurdên Sûriyeyê bi wêneyê Şêx Maşûqê Xeznewî Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan (Human rights watch) a ku navenda wê li New Yorkê ye raporek derxist û di raporê de îşkencekariya Sûriyeyê bi daneyan tê pesendkirin.

Rapor bi sernivîsa "nepejirandina komekê, binpêkirina mafên kurd ên siyasî û çandî ya li Sûriyeyê" hat weşandin û rapora HRW'ê bi van heşt beşan li ser rewşa kurdên başûrojavayê Kurdistanê radiweste:

'Beşa Pêşgotin', 'binpêkirina mafê xwepêşandanan ji adara 2004'an ve', 'zîndankirina rêberên siyasî û çalkavanan', 'rewşa girtiyan, 'awayên dî yên zordariyê', 'standardên navneteweyî yên girîng', 'hin pêşniyar ji bo hikûmeta Sûriyeyê' û herî dawî bi başa 'Spasî'diqede.

Di beşê yekê de rapor ji sala 1957'ê bi yekemîn Partiya Kurdên Sûriyeyê PDK-S dest pê dike. Dûvre rapor di nav çend babetên giring ên girêdayî nasandina kêşa kurdî li Sûriyeyê digere. Mîna, dîrok, rêxistinên siyasî, rûdanên Adara 2004'an û dezgeyên Sûriyeyê yên polîsiye û yên cuda. Babeta dawî ji vî beşî li ser biryarên dadgehane yên ku bêhtir li dijî çalakgerên kurd tên standin.

Beşê duwan ji raporê li ser zordariyên li dijî xwepêşandanên di pey Adara 2004'an e. Ev beş li ser zordariyên li dijî xwepêşandanên mafan, zordariyên li dijî ahengên çandî, zordariyên li dijî çalakiyên bi kurdên Iraq û Tirkiyeyê re û zordariyên li dijî çalakiyên bibîranînan radiweste.

Beşê sisiyan li ser zindankirina rêberên siyasî û çalakvanan e. Di vî beşî de li ser girtiyên van partiyên han tê rawestan. Partiya Yekîtî, Tevgera Paşeroj a Kurd, Partiya Azadî, Partiya Çepê Kurd li Sûriye, Partiya Demokrata Kurd li Sûriyeyê (Al-Partî), PYD (Partiya Yekîtiya Demokrat).

Beşê çaran ji raporê li ser rewşa girtiyan radiweste. Ev beşê han li ser van babetan digere: Zindanên takekesî, îşkence, têkiliyên xerab, rewşa girtîgehan û dadgehên leşkerî.

Beşê pêncan li ser awayên dî yên zordariya radiweste.

Beşê şeşan yê ku li ser standartên navneteweyî yên giring e hatiye dabeşkirin di sê babetan tê vegotin. Babeta yekem azadiya nêrîn, komgirî û xwepêşandin e; babeta duyemîn 'mafên kêmneteWan', babeta sêyemîn jî 'standardên girtin û dadgehkirinê ne'.

Di beşê heftan de rapor hin pêşniyaran pêşkêşî rêjîma Sûriyeyê dike. Ev pêşniyar ji bo guherînên zagonî û guherînên siyasî. Pêşniyarên girêdayî girtin û dadgehkirinên li gor kêfê. Her wiha pêşniyarên girêdayî mafên kurdî. Babeta talî di vî beşî de ji bo komeleya navneteweyî ye. **ŞAM**

## Li Cenevreyê kapîlatlîzm hat şermezarkirin

Dê Rêxistina Bazirganiya Cîhanê (WTO) îro li Swîsreyê civîna xwe bide destpêkirin. Beriya civînê bi hezaran kes daketin qadan li bajarê Cenevreyê ya Swîsreyê li dijî WTO'yê çalakî li dar xistin. Piştî çalakiyan komeke antî kapîtalîst camên hin maxaze û bankayan şikandin û erebe şewitandin. Polîs êrîş bir ser xwepêşanderan û 17 kes girtin bin çavan.

Bi hezaran kes ku sendîka û Partiya Keskan a swîsreyî jî di nav de beriya civîna Rêxistina Bazirganiya Cîhanê (WTO) ya dê îro li Cenevreyê pêk bîne, çalakiyên şermezarkirinê li dar xistin. Di çalakiya ku zêdetirî 3 hezar kes beşdar bû de bênavber dirûşmên "Ji WTO'yê re na" û "Ji kapîtalîzmê re êdî bes e" hatin berzkirin. Di çalakiyê de polîsan tedbîrên xurt ên ewlehiyê girtin. Di axaftinên ku di çalakiyan de hatin kirin polîtîkayên WTO'yê yên li ser welatên xizan bi gotinên "WTO mirovên xizan qetil dike" hatin rexnekirin.

Piştî çalakiyan komeke bi navê 'Bloka Reş' ber bi navenda bajêr ve meşiyan. Bloka Reş, li navenda bajêr zêdetirî 20 erebeyên luks şewitandin û bi dar û tevşoyan êrîşê banka û maxazeyên luks kirin. Polîs bi awayekî tund êrîşê girseyê kir. Ji bo çalakvanan belav bike gaza îsotê bi kar anî û di encamê de 17 kes girtin bin çavan

Midûriyeta polîsan a Cenevreyê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku wan gelek fîşekên hewayî, hesin, zincîr, sprey û amûrên hesin bi dest xistine.

Antî kapîtalîstan jî destnîşan kirin ku dê çalakiyên li dijî civîna WTO'yê ku dê 3 rojan dom bike, bidomin. **CENEVRE**

## AÎDS li Tirkiye û Îngilistanê zêde dibe

Li gorî lêkolîna Departmana AIDS'ê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) bi boneya 1'ê Kanûnê Roja Têkoşîna bi AIDS'ê re amade kirî di nav 8 salên dawiyê de li tevahiya cîhanê AIDS ji sedî 17 kêm bûye bes li Îngilistanê ji sedî 74 û li Tirkiyeyê jî ji sedî 100 zêde bûye.

Bi boneya 1'ê kanûnê Roja Têkoşîna li Dijî AIDS'ê ya Cîhanê di nav hefteyekê de dê belavbûna virûsa HÎV'ê bê nîqaşkirin û xebatên ji sala 2001'an heta niha, bên nirxandin. Çav li rê ye daneyên bingehîn ên têkildarî AIDS'ê di Zîrveya AÎDS'ê ya 2010'an a Viyanayê derkevin holê. Li gorî rapora departmana AÎDS'ê ya NY'ê ji sala 2001'an heta niha li tevahiya cîhanê rêjeya AÎDS'ê ji sedî 17 kêm bûye. Berovajî vê kêmbûna li cîhanê li Îngilistanê ji sedî 74 û li Tirkiyeyê jî ji sedî 100 nexweşiya AÎDS'ê zêde bû.

Li gorî daneyan heta niha 20 milyon kesî ji ber nexweşiya AÎDS'ê jiyana xwe ji dest daye. Di encama tedawiya li dijê AÎDS'ê ya ji hêla Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (RTC) û UNGAAS'ê di belavbûna virûsa HÎV'ê de kêmbûnek berbiçav heye. Cardin jî AÎDS nexweşiya herî zêde mirovan dikuje ye. Li gorî daneyan rojê li derdora 7 hezar 400 kesî bi vê nexweşiyê dikevin. Ji sedî 45'ê van kesan di navbera temenê 15-25 salî de ye. Hejmara herî zêde ya van kesên bi nexweşiyên dikevin ên tiryakê bi kar tînin in.

**Li Tirkiyeyê rewş nebaş e**

Li Tirkiyeyê yekem car nexweşiya AÎDS'ê di sala 1985'an de hate dîtin. Bi zêdebûna têkiliyên hatin û çûyîna ji derve hejmara AÎDS'iyan zêde bû. Li gorî daneyên Wezareta Tenduristiyê niha 2 hezar 711 nexweşên AÎDS'ê hene. Bes li Tirkiyeyê ji ber ku tedbîrên bingehîn û mekanîzmaya kontrolê tune ye, tê texmînkirin ku ev nexweşî gelek zêdetir e. Li gorî daneyên rapora NY'yê li Tirkiyeyê hejmara nexweşên AÎDS'î ji sala 2001'an heta niha berovajî kêmbûna li cîhanê ji sedî sed zêde bûye. Li Tirkiyeyê piraniya kesên AÎDS'î di navbera temenê 25-39'an de ne û gelek ji wan bikêşên eroînê ne. Ligel vê zêdebûnê jî li Tirkiyeyê tedbîrên cidî nayên girtin û ji bo tespîtkirina hejmara nexweşan jî hêj pergalek nehatiye danîn.

**AIDS çawa derdikeve holê?**

Terêfeka AÎDS'ê zû derbasî kesên din dibe. Navê terêfê HÎV e. Terêfa HÎV'ê dema dikeve nav bedena mirovan, berî her tiştî pergala parastina bedenê têk dibe. Di encama vê yekê de beden nikare xwe li hemberî mikrobên ji derve tê biparêze. Terêf piştî vê dibin sedema mirinê. Bi riya têkiliya zayendî û xwînê derbas dibe. **STENBOL (DÎHA)**




## Dostê tîranan nabe endamê YE'yê

Cîgirê hevserokê Komîsyona Têkal a Parlamentoya Ewropayê Parlamenterê Almanyayê Dr. Renate Sommer got ku Serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan wek dostê bijarte yê Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad tevdigere, Serokdewletê Sûdanê Omer El Şerîf ê ku ji ber kujeriyê tê sûcdarkirin dawetî Tirkiyeyê kir û Israîlê jî bi terorîstiyê sûcdar dike. Sommer vegot ku hikûmeteke xwedî vê mantalîteyê nikare bibe endamê Yekîtiya Ewropayê (YE).

Parlamenterê Alman (CDU) Dr. Renate Sommer piştî Parlamentoya Ewropayê rapora pêşxistinê ya Tirkiyeyê qebûl kir daxuyaniyeke nivîskî da.

Sommer di vê daxuyaniyê de hikûmeta Tirk û serokwezîrê wê Erdogan bi zimanekî tund rexne kir. Sommer vegot ku "Tirkiye di nav rewşa heyî de zaroka herî bi problem e". Desteserkirina mafê kêmaran, zextên li ser çapameniyê nirxên



Ewropayê birîndar dike. Balê dikişîne ser helwesta Tirkiyeyê ya ku bi salane nahêle keştiyên Kibrisa Rûm lengerên Tirkiyeyê bi kar bîne û wiha pê de çû: "Ev helwest ne tenê endamtiyê heta şertên endamtiya YE'yê ya destpêkê jî lawaz dike. Pêkan e ku ev bibe sedemê biryargirtina ambargoyeka li dijî Tirkiyeyê. Ev jî zirarê dê bide muzakereyan."

Sommer cih daye axaftin û hewldanên Erdogan ên çend hefteyên dawî jî. Sommer vedibêje ku daxuyaniyên Erdogan wan ji bo daxwaza Erdogan ya endamtiya YE'yê dixe nav fikaran. Sommer bi van mînakan van fikarên xwe pêşkêş dike: "Kesê ku ji Ehmedînejad re bêje dostê min, kesê ku Serokdewletê Sûdanê El Beşîr ku ji ber kujeriyê dadgeh lê digere dawetî welatê xwe bike û kesê ku bi ji hevkarê xwe yê stratejîk (Israîl) bi pêkanîna terora dewletê sûcdar bike ez nafikirim ku bibe endamê YE'yê.

Sommer ji parlamentoyê jî dixwaze daxwazên gel li ber çav bigirin. Li gor Sommer daxwazên gelên ewropî li ber çav nayê girtin û bi korezanî li ser navê berfirekirinê biryarên wisa tên girtin ku dê siberojê xwediyê van biryaran xwe bi xwe nerazî bin. **BRUKSEL**

## Ne qeza ye sabotaj e

Serokê Servîsa Îstîxbatara Navxweyî ya Rûsyayê (FSB) Aleksandir Bortnîkov, diryar kir ku trêna ku sefera Moskow-St.Petersburgê dikir û ji rê derket ne ji ber qezayê ji ber bombeyê pêk hatiye. Hat gotin ku teqîn di hêza 7 kîlogiram TNT'ê de ye û bi armanca sabotajê hatiye teqandin. Di encama vê teqîne de trên ji rê derdikeve û 39 kes dimirin û bi kêmanî 100 kes jî birîndar dibin. Bûyer wek qezayekê hat dayîn. **MOSKOW**

www.arsivakurd.org

# Li hemberî êrîşan bêdeng nemînin!



**Hunermenda Susan Sarandon ku bi têkoşîna xwe ya ji bo mafên jinan tê nasîn ji bo ku balê bikêşe şîdeta cînsî ya li ser jinan banga 'bêdeng nemînin' kir**

Hunermenda navdar Susan Saradon diyar kir ku divê jin li hemû qadên jiyanê û welatê ku lê dijî bêyî tirsa cezakirinê bijî û li qada polîtîkayê xwe bide nîşandan divê xwedî maf bin.

Dema ku şîdeta li hemberî jinan tê gotin welatên weke Kongo, Şîlî, Bosna tê bîra mirovan. Ligel van li gelek welatên ku jîn rastî şîdetê tên hene. Hunermenda amerîkî Susan Sarandon ji bo ko balê bikêşe ser pirsgirêkên wan jinên ku rastî şîdeta cînsî tên bang li hemû jinan kir û xwest ku li hemberî şîdetê bêdeng nemînin.

Sarandon di malpera WITNESS'ê de daxuyaniyek da û daxuyaniya wê li hemû çapemeniyê hat belavkirin. Sarandon di daxuyaniya xwe diyar kir ku şîdeta li dijî jinê li hemê qadên jiyanê derketiye holê û ji bo girîngiya mijarê bîne ziman mînakeke ku li Zimbabweyê hatiye jiyîn pêşkêş kir. Sarandon anî ziman ku ji bo jin di qada polîtîk de jî hebûna xwe bidomînin, divê li her derê îmkan ji wan re bên pêşkêşkirin. Susan Sarandon bal kişand ser şîdeta zayendî ya ku jin di vê qadê dijîn û destnîşan kir ku divê ev yek bên deşîfrekirin.

**Rastî îşkenceyê hat**

Susan Sarandon bi bîr xist ku hêzên dewletê, di 11'ê hezîrana 2008'an de Sekretera Tevgera Guherîna Demokratîk (MDC) Memory Shirinorira bi zorê birin fermandariya leşkerî û li wê derê rastî îşkenceyê hatiye. Piştî îşkenceyê ji aliyê rastî destdirêjiya milîsên dewletê hatiye. Her wiha Sarandon bi lêv kir ku niha zarokên Shirinorira jî di bin gefên milîsên dewletê de ne.

Susan Sarandon diyar kir ku Memory Sihirinorira li dijî hemû rîskan amade ye ku çîroka xwe ji hemû kesan re vebêje û wiha got: "Memory dibêje, ez neçar im ku ji bo jinên din jî rastî van êrîşan neyne, çîroka xwe vebêjim."

**Banga parvekirinê**

Memory Sihirinorira çîroka xwe bi vîdeoyeke vedibêje û dixwaze ku hemû jin vê vîdeoyê temaşê bikin. Susan Sarandon, ji bo Memory Sihirinorira û têkoşîna wê wiha axivî: "Min gelek jinên ku bi rastî êrîşan hatine dîtin. Lê ez care yekem jineke wekî Memory wêrek dît ku çîroka xwe vedibêje. Hûn jî bi wêrekî nêzîkê vê mijarê bibînin di azadbûna şexsê Memory de di hemû jinên Zimbabwe de cih bigirin.

STENBOL (DÎHA)

## Divê jinên ducanî xwe newestînin

Pisporan diyar kir ku divê jinên ducanî îstîrehet bikin û bêhna xwe vedin. Armanca vê yekê ew e ku jinên ducanî hem di warê fîzîkî û hem jî di warê ruhî de xwe rehet hîs bikin.

Pispor dibêjin ku divê jinên ducanî xwe newestînin ev yek ji bo wan û ji bo tenduristiya zarokan ne baş e. Ji ber vê yekê jî dibêjin ku heta ji destên wan tê îstîrehet bikin. Ev dema îstîrehetê jî li gorî rewşa tenduristiya dayikê û dema ducanîbûnê diguhere.

Pispor vê rewşê bêhtir ji bo rîska zûwelidînê, cêwî an jî pirsgirêkeke din hebe pêşniyar dikin. Pispor dibêjin ku ev îstîrehet carna jinan aciz jî dike. Demeke dirêj di nava cihan de mayîn carna dibe sedema pirsgirkên din jî. Ji ber vê yekê jî di bin kontrola pisporan de divê bê kirin. Heke demeke dirêj mirov bêhereket bimîne laşê mirov diqerime. Ji ber vê yekê jî di bin kontrolê de bûn girîng e. Her wiha carna jî jinên ducanî psîkolojiya "ew her tim muhtacî yekî ne" hîs dikin. Di vê rewşê de jî alîkariya psîkolojîk girîng e. AMED



Wêne: Ferhat ARSLAN

## Dayê gorî; zimhêrê şîva şevê ye baş bihêre

*Destarê wan xweş digere. Danê salê digêre û dihêre. Zimhêrê ji bo şîva şevê bi destê dayik û keçzeriyê tê hêran. Çerxa destarî şaxeşûtên jiyanê li ber xwe digêrîne. Çerxa çendan e li ber denklanşora me mayînde bûyî, nayê zanîn. Dayikê destikê destarî girtî wekî soramoniyekê lê dinêre û gêra destanê diajo. Ligel gêra destarî velorîneke ji puxteya jiyanê dide der vedilore. Keçzeriya ku di ser destê dayika xwe re destarî digêrîne, bi girnijîneke şêrînok hem vê saramoniyê dijî û hem jî bargiriya jinê ya li welatê xwe hîn dibe.Dayika wê ligel gêrên destarî 'rastiyeke' jiyanê ya hatiye ferzkirin nîşanî wê dide.*

## SULBUS PÊRÎ

### Ceylanên me

Kuştin û parçeparçekirina bedena Ceylan Onkolê polîtîkaya dijmin a li dijî kurdan careke din aşkera kir.

Bûyer bi parçeyên laşê Ceylanê û şahidên bûyerê aşkera û li ber çavan be jî Wezîrê Karê Hundir, ji bo ku dewletê weke her tim pak nîşan bide û dijminatiya li dijî kurdan veşêrin, sûcên xwe bavêjin stûyê PKK'ê tiştan berovajî dike. Ji bo vê yekê Wezîrê Karê Hundir ketiye nava hewldanan.

Hewldana dewleta tirk reşkirin û veşartina delîlan e. Ji ber vê yekê rapora tiba edlî û daxuyaniyên der barê bûyerê de nedan parêzeran. Ev tişt bi salan e li Kurdistanê diqewimin. Nêzîkbûna dewletê û Hikûmeta AKP'ê jî gumanan zêde dike.

Zihniyeta ku vî gelî ji hef salî heta heftê salî ji bo xwe weke dijmin dibîne û bi hêza dewletê ve qetla kurdan rewa dibîne dê çawa di bin banê xwe de bi van mirovan re aştiyê bîne? Aştî ancax jibîrkirina tol û nefreta li dijî kesên ku jê re dibêjin "dijmin" mimkûn dibe. Şertên aştiya mayînde û biratiyê naskirin û qebûlkirina îradeyên hev mimkûn e.

Divê Komara Tirk û hikûmeta wê ji bo aştî û biratiyê, bi taybetî jî ji bo Tirkiyeyeke demokratîk û azad, heta ji wê jî wêdetir gelê kurd ji bo xwe wekî dijmin nebîne. Li ser vê esasê bi ziman, çand û etnîsîteya wekî neteweyek cuda û welatiyên azad bigire ber çavan. Her wiha wan wekhev bibîne. Dê demê dê aştî pêk bê.

Ji bilî vê yekê nêzîkatiyên din hemû ferzkirina koletî û şer bi xwe ye. Dê xwe bixe nava kiraseke din û wekî demokrat bide nîşandan. Ev jî bi tena serê xwe dê bibe sedama kurkirine pirsgirêkan.

Gelê kurd ji bo azadiyê gelek bedel daye û her tişt daye ber çavên xwe. Gelê kurd dizane ku riya aştiyê qebûlkirina îradaye hev du derbas dibe. Ancax bi vê yekê aştî mumkun e. Çawa ku di şerê azadiyê de hemû fedakarî kiriye û gelek bedel daye dê ji bo aştiyeke bi rûmet jî ji her tiştî re amade ye. Heta niha xwe paşve nekişandiye û nakişîne jî.

Jixwe ji meha nîsanê heta niha bi biryara bê çalakîtiyê gelek şehîd hatine dayîn ji lê dîsa ji bo aştî û demokrasiyê bawariya xwe domandiye û li ber xwe daye.

Lê di vê pêvajoya aştiyê de ligel hemû fedakariyên gelê kurd qetilkirina Ceylan Onkolê, Mehmet Uytunê 18 mehî û qetilkirina zarokên kurd ên din dê çawa bê îzahkirin. Mirov kîjan navî li vê yekê dike?

Divê kesên ku ji xwe re dibêjin ez mirov im li hemberî van pêkanînên dewletê bêdeng nemîne. Divê ji van pêkanînên dijminatiya li dijî gelê kurd re bibêje rawest e.

Heke bi rastî jî dewlet dixwaze aştî pêk bê, divê di serî de pêkanînên xwe yên li Kurdistanê aşkera bike. Rastiya kurdan qebûl bike. Bombeyên ku li bedana Ceylanê teqiyane ji kîjan luleyê derketine bibîne hesab bipirse.

# Mexdûr têne terapîkirin

Li bajarê Parîsa Fransayê di civîneke hate darxistin de rewşa jinên ku rastî şîdeta cînsî hatine û dê çawa bê terapîkirin hate nîqaşkirin. Seroka Komeleya Dijberiya Kolektîfa Tecawîzê Emmanuell Piet got ku jinên ku rastî tecawîzê tên demeke dirêj pirsgirêkên giran dijîn.

Jin û zarokên ku dastî tecawîzê tên bandora vê yekê heta dawiya emrê xwe dijîn. Li Parîsê di civîneke ku hate lidarxistin de pirsgirêkên jinên ku rastî tecawîzê tên û rê û rêbazên terapiyê hatin nîqaşkirin. Emmanuell Piet ku li başûrê Parîsê bijîşktiyê dike û di heman demê de Seroka Komeleya Dijberiya Kollektîfa Tecawîzê ye got ku jin ji ber vê pirsgirêkê di jiyana xwe de gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimînin. Pietê got ku ev yek di lêkolînên ku li herêma ku ew dixebiti de jî hatine tespîtkirin. Di lêkolînê de ji jinan pirsa "hûn heta niha rastî şîdetê hatine an na" tê kirin. Li ser vê esasê jî rewşa wan a tenduristiyê hatiye tahlîlkirin. Piet diyar kir ku encama lêkolînê mirovan matmayî dihêle û wiha axivî: "Yek ji encama lêkolînê ev e. Keseke beriya 16 saliya xwe rastî şîdeta cînsî û fîzîkî tê li gorî keseke rastî vê bûyerê nehatiye 3 qat zêdetir bi nexweşiyên kronîk dikeve. Ev kesên ku rastî şîdetê tên ji sedî 34 teşabusî îhtiharê dikin. Di kesên din de ev rade ji sedî 6 e. Ji 2 kesên ku rastî şîdetê tê yek dikeve depresyonê. Bi kurtasî bûyerên tecawîzê bandoreke neyînî li wan dike."

Emmenuel Piet, got ku ew hem li komeleyê û hem jî li muayenexaneya xwe gelek caran kesên ku rastî tecawîzê hatine dibîne. Jin şîdetê nikarin bînin ziman. Piet diyar kir ku mexdûrên tecawîzê travmayan derbas dikin û wiha berdewam kir: "Jinên ku rastî tecawîzê tên ji sedî 80 trajmayê derbas dikin. Divê ev yek dema terapiyê de li ber çavan bê girtin. Ji bo tedawiyeke baş ev yek pir girîng e."

Li gorî psîkologa bi navê Edna Faoyê ji 4 jinên ku rastî tecawîzê hatine 3 jin piştî tedawiyê pirsgirêkên psîkolojîk dkarin derbas bikin. Lê ji wan yek xwe ji trajmayê nikare rizgar bike. Faoyê got ku ji bo vê yekê jî rê û rêbazên tedawiyê tê pêşxistin û ev rêbaza tedawiyê li Ewropaya Bakur û Hollandayê tê bikaranîn. Faoyê wiha berdewam kir: "Ji ji ber ku naxwazin tiştên ku jiyane bifikirin, nikarin travmayê zû bi zû derbas bikin. Naxwazin tiştên ku bûyerê tîne bira wan bifikirin. Dîsa xwe li cihê ku rastî tecawîzê hatine jî dûr digirin. Ji ber vê yekê jî xwe dixin nava sînoran."

Di çarçoveya tedawiyê de ji bo wê bûyerê bînin bîra xwe û derbas dikin bi jinan re tê axaftin. Ji bo ku bê derbaskirin ev pêwîst e. Faoyê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Tê xwestin ku bûyerê vebêjin. Dema ku vê yekê dikin piştre dibêjin 'êdî ew bûyer derbas bû, pir xirab bû lê êdî derbas bû' Ew bixwe vê tespîtê dikin. Em wan dibin cihê bûyerê. Bi vê yekê em dixwazin ku bila bizanibin êdî ew cih ji bo wan ne xetere ye." PARÎS

# Her roj bi 515 madeyên kîmyewî re rû bi rû ne

Li gorî lêkolîneke jinên ku makyajê dikin her roj ji deodorant (bêhn) heta madeyên din ên makyajê bi 515 madeyên kîmyewî re rû bi rû dimînin.

Madeyên makyajê xetereyeke mezin diafirînin. Zirareke mezin didin jinan û derodorê. Di encama lêkolînêke derket holê ku madeyên kîmyewî ji alerjiyê heta pirsgirêkên cerm ên cur bi cur dibin sedema gelek nexweşiyan. Heta ku dibin sedema pençeşêrê jî. Ji ber vê yekê jî pispor dibêjin ku divê jin baldar bin. LONDON



www.arsivakurdi.org

*Filmê Inglourious Basterds*

Quentin Tarantino dîsa bi fîlmekî balkêş di rojeva sînemayê de ye. Quentin Tarantino bi fîlmê xwe yê dawî yê bi navê "Inglourious Basterds" de behsa hewlên tolhildanê yên jineke Cihû ya ji Naziyan dike. Fîlm li Fransaya ku di bin dagirkeriya Almanan de ye dest pê dike. AMED

*Fîlmê Serdema Qeşayê û dînazor*

Ice Age yanî Serdema Qeşeyê de vê carê bi dînazor derdikevin holê. Serdema Qeşeyê ku zarok û mezin bala her kesî dikişîne bi henek û qeşayên xwe dîsa bal dikşîne. Mişka ku her du fîlmên pêşiyê de li dû gûza xwe diwestiya di vê xelekê de jî we bikenîne. AMED




# Li dijî şer şano



Ji Iraqê, Şanoya Ne Pêkan bi şanoya Behra Bêdengiyê beşdarî Mîhrîcana Şanoyê ya Enqereyê bû. Koma Şonoya Ne Pêkan niha li Bexdayê xebatên xwe didomîne. Koma şanoyê, li dijî şer ev 15 sal in xebatên xwe didomîne

Li Iraqê, piştî ku rejîma Sedam Huseyin bi dawî bû di gelek qadan de pêşveçûnên mezin qewimîn. Yek ji van pêşveçûnan jî şano ye. Şanoger û derhêner Anas Abdul Asamad ê Iraqî derbirî ku li Iraqê gelek komên netewî û nevnetewî hene û li welatê wî li dijî şanoyê tu astengî tune ne.

Ji Iraqê, Şanoya Ne Pêkan bi şanoya Behra Bêdengiyê beşdarî Mîhrîcana Şanoyê ya Enqereyê bû. Koma Şonoya Ne Pêkan niha li Bexdayê xebatên xwe didomîne. Koma şanoyê, li dijî şer ev 15 sal e xebatên xwe didomîne.

Anas Abdul Asamad ku hem lîstikvan û hem jî derhênerê şanoyê ye destnîşan kir ku ev çend salên dawiyê hin derfetên teknîkî bi pêşve çûne ligel vê yekê jî eleqeya gel a şanoyê jî zêdetir bûne. Asamad anî ziman ku li dijî zehmetiyên ji ber şer diqewimin, xebatên şanoyê ber bi başiyê ve diçin. Abdul Asamad bi lêv kir ku niha li Iraqê 6 eywanên şanoyê yên navneteweyî û gelek komên şanoyê hene.

**'Dewlet piştgiriyê nade'**

Asamad, destnîşan kir ku hikûmet tenê alîkariya şanoya navneteweyî û ya dewletê dike. Hin komên ku di nav Iraqê de xebatê dimeşînin jî ji van alîkariyan mehrûm dimînin. Abdul Asamad, diyar kir ku li Iraqê der barê şanoyê de tu astengî dernakevin û ew di vê hêlê de rihet in.

**'Sedam destûra derve nedida'**

Derhêner Asamad destnîşan kir ku rewşa wan a niha li gorî dema Sedam gelek baş e û bilêv kir ku Sedam destûr nedida ku komên şanoyê herin welatekî din û li wê şanoyê bilîzin. ENQERE



## Li Mêrdînê fîlmê kurdî 'Kenê Spî' dest pê kir

Li Mêrdînê kişandina fîlmê kurdî yê Senaryoya wê ji bûyereke hatiye jiyandin pêk tê yê bi navê "Kenê Spî" dest pê kir. Mijara fîlmê di salên 1980'ê de hevaltiya dînekî û zarokan vedibêje.

Li naçveya Nisêbînê ya Mêrdînê kişandina fîlmê kurdî yê bi navê "Kenê Sipî" dest pê kir. Derhêneriya fîlmê Shîar Abdî yê li Ewropayê dijî dike û senaryo jî Selamo nivîsiye. Her wiha Selamo di fîlmê de jî dilîze. Çîroka senaryoyê ji bûyereke hatiye jiyandin hatiye girtin. Çîrok di sala 1980'an de li navçeya Nisêbînê debas bûye. Fîlm bi hevaltiya zarokê bi navê Cengo û dînê navçeyê Xelîlo dest pê dike û cih dide bandora 12'ê îlonê. Xelîlo naaxive û 'bê axiftin' têkiliyê bi zarokan re datîne. Di nav fîlm de nasnameya Xelîlo hêdî hêdî derdikeve holê. Li gorî pêvajoya nû, car caran bûyerên jiyana zarokan û Xelîlo bandor dikin tên şîrovekirin. Kişandina fîlm li navçeyên Nisêbîn û Qoserê yên Mêrdînê û Amedê tê kirin. Ji bilî Selamo hemû lîstikvanên fîlm piranî zarokên Mêrdîn û navçeya Nisêbînê ne. Li gorî plansaziyê fîlm dê di nava meha kanûnê de bi dawî bibe. MÊRDÎN

## 'Çiya gihîşt behrê'

Ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo zarokan lîstikek bi navê 'Çiya gihîşt behrê' hate lîstin. Mijara lîstikê der barê aştiya di nava di gundan de ye ji ber behrê ji hev qetiyaye û dijminantî ketiye navbera wan bi hewldana zarokên gundî her du gund li hev tê. Her roja yekşemê li eywana Şaredariya Mezin tê pêşkêşkirin. Hefteya borî ji bo zarokên di çarçoveya xebatên Şaredariya Baglarê de cih digirtin bê pere hate pêşkêşkirin û zarokan eleqeyeke germ nîşanî şanoyê dan û gelek zarokan cara yekemîn li şanoyê temaşe kirin. AMED

## 'Bila qurbana Ocalan be'

Roj tv bi bernameyeke zindî şeva Cejna Qurbanê û salvegera damezrandina 31'emîn a PKK'ê pîroz kirin û di şevê de gelek stran û helbest hatin xwendin. Di şevê de gelek hunermend, Koma Berxwedan û helbestvan tevlî bûn. Di şevê de helbestvanê kurd Ehmed Huseynî bi helbestên xwe deqeyên gelek hestewar jiya û li ser dikê got: 'Bila gotin û helbest bi qurbana pêlava te bin Ocalanos.'

Federasyona Komelên Kurd ên Belçîkayê FEKBEL di salvegera damezrandina 31'emîn a PKK'ê de şevek amade kir, nêzî hezar kes tevlî şevê bû û şev ji aliyê Roj tv zindî hate pêşkêşkirin.

Koma Berxwedan, Sahiya Stranan, Koma Jinan, Koma Dengbêjan û grûbên folklorê derketin ser dikê. Bi muzîk û grûbên folklorê re bi pêşandana slaytê dîroka PKK'ê hate vegotin. Ehmed Huseynî di şevê de helbesta ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nivîsandibû xwend.

Di şeva 27'ê Mijdarê Roj tv bi bernameyeke zindî û dewlemend, bi beşdariya gelek hunermend û axaftvan şev germ kir. Germahiya şevê gihîşt hestên helbestvanê kurd Ehmed Huseynî û piştî xwendina xwe li ser dika bernameyê got:

"Bila gotin û helbest bi qurbana pêlava te bin Ocalanos" û pelikên di destê xwe de avêtin ser dikê û çû. Ji aliyê tameşevanan û mêvanên şevê pir eleqe dît. Di şevê de Posterê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser dikê cih girtibû. Di şevê de hunermendên jin ên şehîd ketine jî nehatin jibîrkirin û hemû şehîd hatin bibîranîn. BRUKSEL

## Êrîşa Îzmîrê bû mijara hunerê

Nîgarvan, helbestvan, hunermendê vîdeo û performansê Hakan Akçura, li ser êrîşa 22 mijdarê yê Îzmîrê ya li ser konvoya DTP'ê, bi navê "Bîrdariya bi nijadperestiya tirk re rû bi rû hatin" xebateke nû çêkir. Akçura, piştî êrîşa li ser DTP'ê şîroveyên nijadperestiyê ku li ser înternetê hatine weşandin û gotinên dijberiya kurdan di xebata xwe de nîşan dide. Bîrdariya Akçura ji 6 metre bilindtir e û 1265 rêz û 33 hezar û 120 peyvan pêk tê. Bi navê "Bîrdariya rû bi rû hatina nijadperestiya tirk a tijî nefretê li hemberî kesên kurd û neteweya kurd" di înternetê de parve kir. Akçura got, xebata wî 44 santîm fireh û 617 santîm jî dirêj e û armanca wî ev e ku, li hemberî mesajên nijadperestiyên li ser malperên nûçeyan û forûman tên weşandin, bi evîndariya du neteweyan ên tirk û kurd; tirk û ereb, rûm, ermenî derxe pêşberî van.

Akçura diyar kir ku ew piştî kevir, pehin, kulm û sloganên ku li Îzmîrê hemberî konvoya DTP'ê hatin avêtin dest bi xebatê kiriye. Akçura şîroveyên înternetê yên di roja 22 û 23'ê de mijdarê kişandiye xebata xwe û bi vî awayî şîroveyên xwendevanên malperên cur bi cur wergerand berhemek hunerî.

Akçura got: "Xwediyê wan şîroveyan hemû, bi jehra nijadperestiyê seqet bûne. Li her deverê cîhanê ev şîrove dê bibin sedemê lêpirsîna polîsan û ger hemû bêne komkirin, bo bernameyek dijberî nijadperestiyê têkeve rojevê bes e."

Akçura got, bi vê xebatê wî nîşan daye ku, pêdiviya welatê bi rû bi rû hatinek wiha heye û ji ber vê ev şîrove kişandine xebata xwe û wiha dom kir: "48 saet piştî bûyera Îzmîrê vê carê li Çanakkaleyê xwestin 3 ciwanên kurd lînc bikin û bo vê zorê dan qereqolê. Bi vî awayî bi hezaran kes hene û diviyabû min ev xebat kiriba."

Akçura got, "Min ev xebatê bo yên ku vê şerbeta jehr dizanin re na, ne bo yên ku herî kêm qasê min jî dizanin re. Bo yên ku hêj wehameta rewşê nedîtinê re ye." STENBOL




**Kakşar Oremar**

kakshar_oremar@yahoo.de


## Jineke çeleng û dayikek fedakar


Em du heval bûn. Ez û Elî. Hema ji roja yekê metanet û hurmeta wî ji min re balkêş bû, lê tim di nêrînên wî de min hinek tiştên negotî his dikirin. Carna kin û kurt li ser jiyana xwe diaxivî, lê dema tem û mija xemên berê esmanê dilê wî dadigirt, milê min digirt û bi keneke pir sirûştî digot: "De ka tu bi Xudê stranekê bêje" û min jî bi dengê xwe yê nexweş jê re straneke şehîd Mizgîn dixwend: "Lo şivano... ev çend sal e, tu digerî li van çiyan... » Piştre em bûn komek û evîna me tevan yek bû. Li Bakur dengekî xweş û nû dihat û me tevan berê xwe dabû wir. Min tim dixwest ez hevalên xwe û detayên jiyana wan bi berfirehî bizanîbim. Çi tiştê di tûrikê min de hebû, min bi awayekî samîmî ji wan re digot. Carna dema mirov sifra dilê xwe ji kesên nêzî xwe re vedike, xwe barsivik dihesibîne û kesekî hevalê xem an jî şahiyên jiyana xwe dibîne. Xwe bi tenê his nake. Elî ji min re hevalekî wiha bû. Pak û samîmî, dostekî rast û durist, bê tekebir û rûrast. Hinek sifatên wî yên taybetî bûn sedem ku hevaltî an jî dostaniya me heta roja îro bi germiya rojên destpêkê, berdewam bike. Rojekê ez çûm mala wan û dayikek hêja çawa ku Elî maç kir, weke kurê xwe ez jî maç kirim. Ev çand di nava kurda de xwedî dîrokek dûr û dirêj e û li hemberî tofanên giran sebebekî mayîna me kurdan e. Bi qasî dayika xwe min jê hez kir.


Rûyê wê tim bi ken bû. Ji çavên wê muhebeta dayikeke dilovan dibarî. Gotinên wê wisa nerm û helîm bûn ku te bixwesta-nexwesta neçar bûyî hurmeta wê bigirî. Serbihoriya wê romaneke nenivîsîndî ye. Ger Maksîm Gorkî yekî me hebûya dê çîroka jiyana wê jî bikira romaneke dîrokî.

Gelek cara min jê daxwaz kir ku li ser jiyana xwe ya salên berê, li ser jiyana penaberî û salên der bi deriyê, li ser êş û elemên tenê mayînê, torekirin û xwedîkirina zarokên sava, li ser wefadariya ji hevlaê xwe yê qehreman û mêrxas re û... biaxive, lê tim wiha digot:" kurê min dilê min dayax nake… ez nikarim behsa wan salên reş bikem. Tev nexweşî û rojên nexweş bûn. Ez çi bêjim, çinebêjim law….?" û li pey wê jî çavên wê tejî dibûn û bêdeng dima. Tim bi wê heseretê dijî ku rojekê azadiya Kurdistanê bibîne.

Hê genc bû ku hevalê wê (Elî Halo) şehîd bû. Li pey wê zêdetir ji 45 salan li kêleka kurên xwe û weke mezineke malbatê liyaqet û hurmeta xwe ya bilind ji herkesî re de îspatkir. Di çanda kurdan de ji van jinan re „serejin" tê gotin. Yanî jinên ku serekêşiya jinên malbat an jî hêrêmekê dikin û wek nimûne tên nîşan dan. Jinên wî`ha bi gotin û karê xwe bûn sedem ku axaftina" şêr sêhere, çi jine çi mêre..." bikeve nava çanda kurdan.

Min li ser mîrasê jinê di parastina huner û ferhenga kurdan de gelek cara nivîsandiye. Dema min xebera dawiyê ya dayika Pîroz Halo bihîst, wefadarî û sed sifetên wê yên mirovheziyê hatin bîra min. Hêşat jî dengê wê yê daykane di guhê min daye: "Kurê min çi pirsgirêk nîn in ku çareser nebin, gere hûn mêr bin û ji bo standina mafên xwe kar û xebatê bikin..." Tim bi hesreta azadiyê dijî. Bi rastî hevalno em tev deyndarên dayikên xwe ne. Dayikên mîna wê xwedî rolekî mezinin ku em bibin evîndarên azadî û ramana azad. Belkî tenê ev ji mera bes be ku bi dayikeke weke Pîroz serbilind bin û ji hêzeke nû di hestên me de biafirîne. Ez tenê bi vê re dikarim xema dûriya dayika xwe tehemûl bikim. Min tim ew ji xwe re dayikeke hêja û ezîz dihesiband. Ew jineke çeleng û ji me tevan re pir fedakar bû.





# XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | ■ | | | | | | |
| 3 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 4 | | ■ | | | | | ■ | | ■ |
| 5 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 6 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 9 | | | | | | | | ■ | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Ilmê ku li ser hebûna Xwedê û rastiya dînê îslamê disekine... Tehm, lezet **2.** Cureyekî xwînê... Xwarina ku bêhna dûyî di çêja wê de pêk hatiye **3.** Tiştê ku di pileya duyemîn de ye... Vexwarina sereke **4.** Sala em tê de ne **5.** Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Nedirêj, kurt **6.** Dadwer... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd. **7.** Di zimanê zarokan de lêxistin... Nexweşiyek... Pirsek di rewşa ne tewandî de **8.** Alif, xwarina sewalan... Rûpela sereke ya kovar û pirtûkê **9.** Stêrka Zuhelê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Çiyayekî me... Bûjeneke qehweyî ya ku ji ber şilbûnê li ser rûyê hesinan peyda dibe, zeng **2.** Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe **3.** Paytexta Perûyê... Eşîr, qebîle, hoz **4.** Cihê herî kûr ê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Parlamentoya Rûsyayê **5.** Notayek... Nêrîn **6.** 12 meh an jî 365 roj... Qertafeke neyînî **7.** Şiv... Rengek **8.** Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Alîkarê keyayê gund **9.** Kesê ku zû hîn dibe û wî tiştî hiltîne... Tûj... Dewara nêr

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | Ş | Î | N | ■ | A | M | E | D |
| 2 | S | ■ | D | E | M | ■ | A | W | A |
| 3 | O | X | ■ | G | E | Ş | T | ■ | X |
| 4 | L | A | L | O | T | E | ■ | D | ■ |
| 5 | ■ | L | ■ | T | ■ | K | E | R | Î |
| 6 | S | ■ | L | Î | S | ■ | C | A | N |
| 7 | A | S | A | ■ | A | L | E | M | ■ |
| 8 | E | S | M | E | R | ■ | M | ■ | N |
| 9 | T | ■ | A | Y | ■ | L | Î | M | A |



Yildiz Gultekin
yildizgultekin@hotmail.com

# Şerê Şênê û Porteqalê


Şênê hevala min a çend salan e, ez û ew hema em bêjin bi hevra mezin bûne, çuyîn û hatina me hertim bi hevra bû, heta wê ji xwe re mêrek dît û mêr kir, mêrê wê jî weke şekira bû, weke kakil û kunciya bû, ew mêrik devê wî hebû lê ziman tunebû, ewqasî bê deng û bê his bû, hema te jêra bigota çi wî digot erê. Lê şêna me jî tu carê ji jiyana xwe razî nebûye, her tim wê digot ev jiyana ez di nav de me ne tu jiyan e, ez layiqî van deran nînim. Rojek, du roj, hema kengê em dihatin ba hev, şênê qala jiyaneke nebaş dikir, dawiyê de Porteqal teqiya got, te jiyana xwe de mêrekî baş dîtiye lê tu ji wî jî razî nîn î. Ev çi halê teye!Hela der û dora xwe binêre mêrê xelkê çi tînin serê jinên xwe! ew jin ji sibê heta êvarê cil û firxa dişon, nên dipêjin, zarokan mezin dikin, heywanan dinêrin, tepika dikutin, lê dîsa jî dibêjin em van karan dikin hema bila mêrê me ji me razîbûna xwe qebûl bikin. Lê tu vî halê xwe kesekî razî nînî, ew mêre ku derdê te dikişîne, xwezî mêrekî weke cinawara rastî te bihata, wê çaxê te yê bigota heeey waaaxxx, ev çi hale ez tê de me.

Yek ji wê û yek ji wê, vana bi gijika hev girt, li dora hev birin û anîn, ez ketim navbera wan, min ew ji hev veqetand, dawîyê de Şênê ji Porteqalê re got waye ez difikirim çavên te li pey mêrê min e, dibe ku te çav berdaye mêrikê min, careke din Porteqalê bi destê cepê go şîîîrq yek li Şênê xist. Min anîn mala xwe, min got rûnên li vê derê çi gotinên we hene li vir bêjin, hûn weke wan jinên dinê neditî li derva qala mêran dikin û li ser mêra gijika hev digrin, qet hûn şerm nakin, ya hûn dikin tu kesek nake.

Porteqalê got ev jinik dîn bûye, li mala xwe de nikare karekî bike,belkêm mêrê wê jî lê razî nîne, lê ew hêrsa xwe hertim li der û dora xwe derdixe, ev jinik dîn û har bûye. Min dane sekinandin, paşê dema êvarê Şênê ji me re qala gotinên mêrê xwe kir. Mêrê wê gotiye tu jî jin î qey, hela mêzeke waye Porteqal çend zarokan, çend cînara, çend hevalên xwe îdare dike, tu jî heta êvarê mize miz dikî, tu tiştekî qayîl nabî, ez dinê ji li ber lingê te raxim dîsa jî rûyê te tim li erdê ye, ez naxwazim tu wisa li min binêrî, weke jina malan li ber mala xwe bisekine.

Hemû gotinên mêrik ev bûne, lê şêna me jî dexesî li Porteqalê kiriye, seba vê wan gijika hev girtiye. Axxx Porteqal sed carî min ji te re got qarişî jiyana der û cînara nebe, ew car caran xelet fêm dikin, min got şêna delal heke mêrikê te qala van gotina kiriye, nayê wê manê ku mêrê te çav berî Porteqalê daye, ya wî jî rast nîne lê carekê gotin li devê meriya derdikeve meriv nizane ew gotin diçe ku derê. seba vê jî xwe ne qehirîne, mêrê te belkêm dilekî temîz gotiye lê te xelet fêm kiriye, werin rûyê hev maçî bikin bila ev kirin li vir biqede, careke din jî wiha qelbê hev neşkênin. Ma meriv qet seba mêra qelbê hev dişkêne porkurno!






# Padîşah û îdamkirina mirîşkê

Dibêjin rojekê padîşahek mirovekî bi cezayê îdamê gunehbar dike. Dûre padîşah mirîşkekê dide wî û ji wî re dibêje here di nava hefteyekê de tu vê mirîşkê çawa idam bikî ez ê jî te bi wî awayî îdam bikim lê belê heger tu vê mirîşkê bi awayekî ku îdam bikî heger însan bi wî awayî neyê îdamkirin ez ê te azad bikim, de here ji xwe re rêbazekê bibîne...

Li ser vê biryara padîşah mirovê gunehbar mirîşka xwe dixe hembêza xwe û ew dikeve nava çarşî, sûk, kuçe û kolanan digere û ji kal û pîran, qîz û bûkan, zarok û dayikan dipirse û ji xwe re li çareseriyekê digere. Lê ew tu çareseriyê peyda nake û her ku dere dem li wî teng dibe. Êdî xewa şev û rojan li wî diherime êdî sebir û tebat nakeve nava dil û cîgerên wî.

Ew êvarekê radihîje mirîşka xwe û dere derdikeve perê bajêr û ji xwe re kûr û kûr difikire, carekê dinêre ku nêzî wî komek mirov li hevdu kom bûne û araqê vedixwin û kêf kêfa wan e, dinya ne li ser per û baskên wan e. Dibêje, ez ê derdê xwe ji wan re bêjim belkî ew ji min re çareyekê bibînim. Ew radibe ser xwe û diçe cem koma mirovên ku araqê vedixwarin. Silavê li wan dike dere pisgirêka xwe û padîşah û îdamkirina mirîşkê ji wan re dibêje dûre alîkariyê dixwaze.

Jixwe ew hemû jî serxweşbûn û kêfa wan li cîbû.

Piştî ku mirovê xwediyê mirîşkê alîkariyê ji wan dixwaze û dibêje kanî ez ê vê mirîşkê çawa îdam bikim ku ez bi wî awayî neyêm îdamkirin. Koma serxweşan hemû bi hev re bi wî dikenin û dûre ew ji wî re dibêjin here serê mirîşkê sabûn bike û di qûna xwe bixe. Na em çi zanin tu yê mirîşka xwe çawa îdam bikî haydê zûka ji ser serê me here kêfa me jî xera neke. Mirovên serxweş her çiqasî henekên xwe bi wî bikin û bi wî re dixeyidin lê ew gotina wan dikeve serê wî. Ew hema yekser tê malê tiştê ku mirovê serxweş jê re gotibû dike. Serê sibehê mirîşa xwe dibe dere cem padîşah. Padîşah jê re dibêje te çawa mirîşk îdam kiriye bêje ez ê jî te wisa îdam bikim...

Padîşah dinêre ku bi wî awayî insan nayê îdamkirin, jê re dibêje temam min te azad kir here mala xwe tu bi ser ketî... *Naîl DEMÎR*




www.arsivakurdi.org

## Nalîneke xedar

*Ev çend roj û şev xewn û*
*xeyalên bêsînor*
*Dorpêç kiriye keştiya*
*xewngeha min*
*Awaz û qîrîneke kûr*
*Nalîneke dilşewat*
*Ji keştiyeke nepen û nedîtbar*
*berz dibe*
*Di dilekî xoşewîst de*
*sînyaleke ronak dide*
*Alandiye gewriya min*
*heyokên şevereşk*
*Bêhnçikandî, qirik tijî*
*Dinepixîne zengilora min*
*Dilerize laşê min*
*Diricifim wek pelên ser û ber*
*Lê……!*
*Neçariyek girtiye dest û ling*
*bêlebat*
*Ne livadin ne jî hewldanek ji*
*min tê*

*Bang dikim, qîr didim*
*Tu kes bersivê nade*
*Û*
*Bêxemî serwer e*
*Peyvên ji zengilora zuha*
*dipekin*
*Wek liba kovana vala*
*Bêwate difirin, zingînî û*
*nagihîjin nîşanê*
*Çokên min fis, bêteqet*
*Dixwazim rabim bipekim*
*çargava*
*Baz bidim, bifirim û heya*
*dawî bi lezgînî*
*Hembêz bikim xwediyê*
*nalîna dilkeser*
*Lê …!*
*Di rêwîtiya xewnerojka*
*xumam de*
*Heyamên ne ser û ber dîl*
*girtiye*
*Şevereşkek serwerê asoya*
*şevê ye*
*mêvanekî pêkut dest daniye*
*Ser xewngeha bêpejnî.*

RAHMÎ BALDAK



# Qanûna bingehîn a yekem û qanûna cezayê ya hatiyan

AMED TÎGRÎS

Berê ji Hatiyan re digotin Hîtit. Heta tirkan navê Etî li wan kiribû. Arkeologan di van salên dawî de derxistin holê ku navê wan Hatî ye. Hatî bi kurdî ye. Yên ku ji çiyayê Zagrosan ber bi Anatolyayê ve hatine û ji wan re gotine Hatî. Zimanê wan hînd-ewropî bûye. Paytexta wan Hatûşa, navê çend padîşahên wan jî Hatûşîlî bûye.

Di dema qiral Telepînû de rewşa împaratoriya Hatiyan ketiye nav metirsiyeke mezin. Di nav malbata qiral de şerê text hebûye. Ji bo derketina ser text her dem xwîn rêtine. Ji bo qiraltiyê malbatên qiral bi destê arîstokratên serayê hevdu kuştine. Bav lawê, bira bira, mam pismam, xal xwarzî dane kuştin. Weha bûye ku kes nizane dê sibehê kî were kuştin û kî bibe qiral. Ji ber van kuştinên text, împaratorî jî sist bûye û gelek welat û herêm êdî ji bin desthilatdariya Hatiyan derketine û yek bi yek serbixwe bûne. Ji bo pêş li şerê text were girtin, xwîna malbata qiral êdî neyê rêtin û problemên împaratoriyê werin çareserkirin, berî mîladê di salên 1500'î de qiralê Hatiyan yê wê demê Telepînû biryareke redîkal digire. Qiral Pankûyê dicivîne. Pankû navê meclîsa Hatiyan a wê demê bûye. Endamên Pankûyê ji malmezinên Hatiyan hatine hilbijartin. Weha diyar dibe ku sîstema Hatiyan wek a monarşiya dema niha bûye. Li jor qiral û ji bin qiral ve jî Pankû hebûye. Telepînû biryarên ku werin girtin ji endamên Pankûyê re xwendiye. Arkeolog ji van biryar û rêbazên Telepînû re qanûna bingehîn a yekem dibêjin. Telepînû her weha cara yekem meşrûbûna qiraliyetê raxistiye ser lewheyên axîn. Cara yekem biryar û rêbaz hatine xwendin û wek dokument hatine nivîsin. Bi kurdî çend xalên qanûna bingehîn a Telepînû ev in:

✓ Cezayê kuştinê ji navê radike û werdigerînê koçkirin û barkirinê.

✓ Prensê ku ji jina qiral e fermî be û di dereceya yekem de be, dibe qiral. Heger di dereca yekem de prens tune be, yê di dereceya duyem de dibe qiral. Heger ew jî tune be, yê di dereca yekem de bi prensesayê şû kiribe (mêr kiribe), dibe qiral.

✓ Di mijar û doza xwînî de, ji vir bi şûn ve hemû malbat ne berpirs e û nayê cezakirin. Her kes ji xwe û sûcê ku kiriye berpirs e. (Heta wê demê ku yekî sûcek bikira hemû malbat dihat kuştin.)

✓ Pankû lijneya herî bilind e. Kî li dijî van qanûnan were, Pankû biryara cezadayîna wî/wê dide. Her weha Pankû der heqê Qiral de jî dikare biryaran bide. Pankû êdî dadgeh û lijneya herî bilind e.

> Telepînû biryarên ku werin girtin ji endamên Pankûyê re xwendiye. Arkeolog ji van biryar û rêbazên Telepînû re qanûna bingehîn a yekem dibêjin. Telepînû her weha cara yekem meşrûbûna qiraliyetê raxistiye ser lewheyên axîn

Ji derî vê qanûna bingehîn Hatî di warê edaletê de li gor serdema xwe gelekî li pêş bûne. Împaratorî xwediyê qanûn, rê û rêbazan bûye. Ka em niha li çend xalên qanûna wan a giştî binêrin ew çawa bûn û behsa çi dikirin: *

✓ Kesên ku malê xwedê bidizin cezayê herî giran digirin.

✓ Xwediyê xwînê çi bêje ew dibe, lê di dawiyê de diçe cem qiral û qiral biryara dawî dide.

✓ Kesên ku malê qiral bidizin cezayê wan û yê malê xelkê bidize yek e.

✓ Heger kesek conegayek bidize, di şûna conega de divê 15 dewaran bide.

✓ Heger kesek serê mirovekî azad bişikêne, heta ku ew rehet bibe, divê kesekî bişîna mala wî û karê wî bike. Dema birîna wî baş bû jî wek ceza divê 10 şekel zîv ceza bide. (10 şekel meaşê meheke wê demê bûye.) Heger kesê birîndat kole be, divê 2 şekel zîv bide.

✓ Heger bi lêdanê mirovê azad kor bibe, zordest an sûcdar divê 2 mîna zîv bide. Lê ku bi şaşî kor bike divê 10 şekel bide.

✓ Heger mirovekî azad û jineke kole ji hev hez bikin û şû bikin, piştre dema delaq dan, mal parve dikin. Zarok ji mêr re dikevin, lê divê zarokekê jî bide jinê.

✓ Heger mirovek destdirêjiya (tecawizê) beraz an dêlikekê bike, cezayê mirinê heq dike, lê dîsa camêr dibin ber deriyê serayê û di dawiyê de qiral biryarê dide.

** Birgit Brandan-Hartmut Schickert, Hititler bilinmiyen bir dunya imparatorlugu, (Hîtîtî, Împaratoriya cîhaneke nayê zanîn) rûpel 94, Arkadaş Yayinlari-Stenbol*






## Dêrsim

*Çiyayên Dêrsimê rêl e mazî ye,*
*Koçberî û komkujî gelek dîtiye.*
*Sedema wî; kurd e, elewî ye.*
*Li ber zilm û neheqiyê netewiye.*

*Di baweriya wan de rastî ye mirovahî ye.*
*Ev ji neyarê qewmê romî ye.*
*Tirs û xiroş bi dilê kemalîstan ketiye.*

*Pîr û kal, jin û zaro li kesî neboriye.*

*Çemê Munzurê gewahiyê wê ye.*
*Bi rojan kelex û xwîn tê de hatiye*
*Dîrokê şapat û zilm wekî wî nedîtiye.*
*Digotin, bikujin kurdên elewî ne.*

*Dinya li me çavên xwe girtiye.*

*Qir u awaz ên me kesî nebihîstiye.*
*Heta neviyên wan, gerîla rabûye.*
*Me bi wan xwe dît û xwe nas kiriye.*

*Neyaran paşve gav avêtine*
*Ji kurdan dixwazin lêborînê.*
*Gunehê wan giran e, qewmê romî ne.*
*Qîm û bawerî di dostaniya wan de nîn e.*

HEVAL GOYÎ

www.arsivakurd.org

ROJEV
30 Mijdar 2009 Hejmar: 18 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

**Licêya Amedê ku xwedî dîrokeke kevnare ye, ligel zext û zordariyan heta îro li ser piyan sekiniye. Di dîrokê de ji gelek şaristaniyan re malovanî kiriye. Licê di salên 90'î de salên herî dijwar jiyane**

# Dîroka kevnare ya Licê





## Salên ji agir

Licê di salên 1990'î de salên herî dijwar dijî. Bi taybetî di dema Osmaniyan û tirkan de rastî pêkûtiyên dijwar tên. Di salên 90'î de dewleta tirk di seranserê herêmê pêkûtiyên derveyîmirovahiyê pêk anî. Her wiha navçeya Licê jî ji vê zext û zordariyê para xwe girt. Dewleta tirk zirarên mezin dan gelê Licê. Malên wan şewitandin û ew koçber kirin. Di sala 1993'an di 21 û 26'ê kewçerê de li Licê êrîşeke mezin pêk hat. Di vê êrîşê de ji 30'yî zêdetir welatî hatin qetilkikrin.

Jina bi navê Zarîfe Canturk ku di wê êrîşê de birîndar bibû wiha digot: "Ewil dengê çekan hat. Piştre dest bi topavêtinê kirin. Ji balafiran agir bi ser me de dibarandin. Bimbe diavêtin malên me. Bi van amûran malên me dişewitandin. Hinek mirov ji ber ku di mal de bûn, şewitîn. Lê yên ji mal direviyan jî bi çekan êrîşê wan dikirin."

Bi rastî jî kesên hatin kuştin bê sûc û bê guneh bûn. Ev êrîş li Şirnexê dest pê kiribû û li Licê berdewam dikir. Di salên 1994 û 95'an de gund hatin talankirin û şewitandin. Bi hezaran welatiyan koç kir. Dewletê pergala cerdevaniyê li navçeyê pêş xistibû. Kesên ku koç nekirina, cerdevanî lê ferz dikirin. Kesên ku qebûl nekirina jî ew wekî neyar didîtin. Gelê Licê bi taybetî jî di van salan de zext û zehmetiyên mezin kişandin.

Ozan KILINÇ / AMED

Navçeya Licêya Amedê xwedî dîrokeke herî kevn e. Tê zanîn ku li Licê, jiyan gelek berê dest pê kiriye. Nivîskarên Asûriyan dîroka Licê digihînin salên beriya zayînê. Li gor agahiyan di dema gelên Mîttanî û Hurî de dijîn. Navê wê yê yekem ku di çavkaniyan de derbas dibe "şirişa" ye.

Li ser navê wê yê Licê her çiqas hinek efsane û bûyer hebin jî di vê mijarê de, zelaliyek tuneye. Navê wê ji ku hatiye, ji kîjan demê maye ne diyar e.Tê gotin ku li Licê jiyan gelek berê dest pê kiriye. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin ev dem ji beriya zayînî di sedsala 7000'î dest pê dike û digihêje dema Neolotikê ya dawî dema sifir. Beriya zayînê di sedsala 14'an de dema Asûrî, Mîttanî û Hûrriyan bi dawî dibe. Li Licê her çiqas gelek şaristanî hebin jî bi piranî di bin destê Asûriyan de maye. Piştre dikeve destê Med, Pers, Makedon, Part û Romayê. Piştî zayînê di salên 622–639'ê de Licê dikeve destê Bîzansê.

Di dema Hz. Omer de artêşên di bin fermandariya Îyaz Bîn Ganem û Xalîd Bîn Welîd, êrîşê Bîzansê dikin û li dû vî şerî Amed û hemû navçeyên wê bi dest dixin. Piştî şerê Siffîn û hilbijartina xelîfetiya Mûawiye, dugelên Emewî tê damezrandin. Bi vî awayî Mezopotamya û Amed girêdayî dugelên Emewî dimîne. Piştî Emewiyan navçe di destê Ebasiyan de ye. Ebasî ji ber ku tim bi Bîzansiyan re di şer de ne, bêhêz dikevin. Ji vir şûnde navçe dikeve destê Merwaniyan. Piştî Merwaniyan Amed û Licê di bin hikumdariya Selçûkiyan de ye. Heta mirina Melîk Şah navçe di bin destê Selçûkiyan de ye. Piştî mirina Melîk Şah valabûna desthilatiyê pêk hat. Di wê demê de jî birayê wî Tûtûş li Sûriyeyê dijiya tê Licê û xwe bi gel dide nasîn.



Piştî mirina Tûtûş ku di sala 1098'an de ye Licê dikeve destê Ahlatşahiyan. Di sala 1222'an de Amed û sûrên dora wê ji alî Îlhaniyan tê talankirin û piştî demekê dikeve destê Eyûbiyan. Ji vir pê de êdî herêm dibe nevanda şerên Eyûbî û Selçûkiyên Anatolî ye.

### Di 1871'ê de dibe naçeya Amedê

Rewşa navçeyê heta sala 1390'an bi vî awayî didome. Di sala 1394'an de Tîmur bi dorpêçkirinekê Amedê digire. Piştre Tîmûr herêmê ji Kara Yuluk Osman re dihêle. Bi vî awayî herêm di sala 1401'an de jî dikeve bin destê Akkoyûniyan. Di sala 1502'an de Safavî di şerê Şûrûrê de Akkoyûniyan têk dibin û ji vir pê de êdî ew li herêmê serdest dibin. Ev rewş heta dema Osmaniyan berdewam dike. Di sala 1517'an de dikeve bin destê Osmaniyan û di sala 1871'an de jî dibe navçeyek bi ser Amedê. Ewil gundê bi ser navenda Antakê ye, piştre bûye navçeya Amedê. Hêne jî bi Licê ve tê girêdan. Di sala 1910'an de di veşandina salnameyê de tê xuyakirin ku Karaz jî bi ser Licê ye. Ev rewş heta sala 1924'an berdewam dike.

### Şaredarî 1867'an hatiye avakirin

Licê, li bakurê rojhilatê Amedê ye. Berê ji bo çûyîn û hatinê rê tunebûn. Lê niha ji riya Çewlik û Amedê hatin û çûndin roj bi roj zêde dibe. Pêş ve diçe. Herêma Licê xwedî dîrokek kevnare ye, şaredariya wê di sala 1867'an de hatiye avakirin.

### Şikeft û keleyên navdar

Li licê gelek şikeft û keleyên navdar ên girîng hene. Şikefta Birkleyn, Kelehên Çepe, Mele û Atak, Xirabeyên Dakyanûs, Şikefta Hevalên Şikeftê, Karwansarayê li gundê Çepera li Licê ne. Tirbeya Şêx Bîlal, Kaniya Atan ku ji nexweşiya tayê re dibe şîfa li Licê cih digirin û her wiha gelek cihên wê yên tûrîstîk hene.

### Rewşa erdnîgarî

Çavkaniya debarê ya navçeyê çandinî û sewalkarî ye. Her wiha heta niha li navçeyê 4 car caran erdhêj pêk hatiye. Di 6'ê îlona sala 1975'an de li Licê erdehêjek mezin çêbû. Navçe piştî erdheja 1975'an serobin dibe û her tişt hildiweşe. Di vê erdhêjê de 2367 kes jiyana xwe ji dest dide. 35 gund jî xesarên mezin dibînin.

Di navbera Licê û Amedê de 90 km heye. 13 tax, 56 gund û 112 mezreyên navçeya Licê hene. Di sala 1042'an de gelek pêşve diçe û di pêvajoyê de êdî dibe navçe.

Li Licê şilî zêde ye. Li çiyayên bakurê Licê şilî pir zêde ye. Şiliya herî mezin di biharê de ye. Herî hindik jî havînê dibare. Di mehên tîrmeh û tebaxê de erdên Licê ji ber germahiyê hişk dibin. Zivistanê jî herêma Licê gelek dijwar derbas dibe. Dîsa li gorî navçeyên din li herêmê berfa herî zêde li Licê dibare. Ji ber ku berf pir dibare riyên Licê gelek caran tên girtin.

## Gundên Licê



1. Korxa 2. Zengesor 3. Huseynîg 4. Mişirf 5. Barav 6. Karincag 7. Hezmaz 8. Çemê Elik 9. Cinezûr 10. Licok 11. Xana Kelê12. Cofitin 13. Sernis 14. Comelaş 15. Til 16. Biryas 17. Dêrxust 18. Zeng 19. Dêrqam 20. Mala Mihê Biro 21. Mala Mihê Mîro 22. Mark 23. Balicin 24. Zerra 25. Celik 26. Pêçar 27. Pêçara Jêr 28. Şêxan 29. Hêdîg 30. Entax 31. Zoxasalan 32.Kilêdar 33. Darakol 34. Fûm 35. Bamitin 36. Nenyas 37. Sinê 38.Şaverdiyan 39. Şaxor 40. Hezan 41. Pîrik 42. Banê Dêran 43. Xweylîn 44. Beşîşt 45. Firdeys 46.Heşedere 47. Bawerd 48. Dizeynî 49. Kerwes 50. Xosor 51. Tûtê 52. Sîsê 53. Hendîv 54. Melê 55. Fîs 56. Benî